

ARMANC
Xwedî: Yekîtiya
Karkerê
Demokratên
Kurdistanê
★
Ji mehê carekê
dertê
Hejmar : 69
Sibat 1987
Buha: 10 Skr.
2,5 DM

Armanc

SERXWEBÜN • DEMOKRASİ • SOSYALİZM

ARMANC
Issue by
The Demokratic
Union of
Kurdish Workers
★
Monthly Kurdish
Magazine
Nr : 69
February 1987
Price: 10 SK.
2,5 DM

Address : Nordenflychtvägen 20, 112 51, Stockholm, Tel: 08 - 52 87 56 □ Adresa têkili û naman : P.O. BOX 240 12, 750 24 Uppsala / SWEDEN □ Postgiro : 50 37 99 - 9 □ ISSN 0348-7388

Şefê Polîsê Stockholmê Hans Holmér Şemîtî!

Spekulasyona li ser Kurdan pûç derket

□ Kurdên ku bi şika tevêbûna qetla Olof Palme ji bal polîs ve hatibûn girtin, her di wê rojê de ji bal mudîumûm (savci) htin berdan. Mudîumûm Clas Zaime: "Tu delîl li ser kesen hatine girtin nînin ku bi şika tevêbûna kuştina Palme bêñ mahkeme kirin."



Claes Zaime (yê milê çepê): Hans Holmér, dev ji vê şopê berde

Çend roja pişti serê salê, polîsê Stockholmê destê sibê êris bir ser malêñ hin Kurden heval û sempâtizanê PKK ê û hin kesen ku miliyeta wan nehate eşkerekirin. Di opçasyonê de 20 kes hatin girtin

KURMÊ DARÊ NE JI DARÊ BE DAR NARIZE

Ev salek bû ku hin rojnamêñ Swêdi yêñ paşverû, bi bahana PKK ê spekulasyona navê Kurden li dor cînaya Olof Palme dibirin û danîn; bi manşetên sansasyonel idîa dikirin ku di mesela kuştina Olof Palme de şika Polîs a esasî li ser PKK ye. Lî ev rojname, bi navê vê rîxistinê jî nediman, bi tevâñ navê Kurden tevî vî karê qirêj dikirin.

Balona spekulasyonê, wilo hat pufdanê ku di destpêka serê sala nuh de nepixandina wê gihast dawiya tehemula xwe û çend roj pişti serê salê balon teqîya: Polîsê Swêd, bi şika beşdarbûna qetla Palme hin Kurd girtin bin çav. Li gor Polîs ev kes endam û dilxwazan PKK'ê bûn û resmî diyar bû ku şika esasî ya Polîs li ser hin Kurden e. Lî kesen gîrî gava hatin derxistin pêşberî mudeîamê tehqîqata cînayeta Palme, her di wê rojê de hatin berdan. Li gor mudeîam, tu delîl li ser wan tunebûn ku meriv karibe bi şika beşdarbûna cînayetê wan bigre derxe ber mehkemê.

Bî vî awayî roja ku balona şefê Polîs Hans Holmér û hin rojnamêñ paşverû teqîya, xuya bû ku ji pufa bayê pêştir tu tişt tê de nîne.

Heyeta mudeîama didin xuyakirin ku ji şopgerandina li pey Kurden tu tişt dernakeve, divê polîs bide ser şopek din. Bi van beyana eşkere dibe ku, idîayê salekê yêñ li pey navê Kurden xwe naspêrin tu delîl û dokument û şopêñ esasî. Her çiqas polîs idîa dike ku ji şika xwe ji %95 bawer e ji, tişte heta iro tê xuyakirin, ku polîs tehqîqata xwe ne li ser delîlêñ maddî, lî li ser hin tiştên din ava kiriye. Çine ev tiş?

Ji roja kuştina Palme bi vir de ye ku hêzên kevneperek û Swêdi, MIT'a Tirk, CIA û istixbarata Swêdi bi dezînformasyon û demagojiyêñ siyasi, dibin tînin vê gunehkariya mezin dixin hustuyê Kurden. Ji kuştina Palme û heta iro MIT'a Tirk ci di rojnamêñ Tirkî re be, ci di riya têkiliyêñ istixbaratî yêñ dizî re be ji bo ku karibe cînayetê têxe hustuyê Kurden, ci ji destê wî tê dike. Her çiqas iro di şika kuştina Palme de şika li ser hêzên kevneperek, faşîst û dijî komunîst ên bi CIA'ya Amerîka ve girêdayî gelek xurtir be ji, navê wan di presê de gelek derbas nabe, tehqîqata li ser wan tê veşartin. Her û her cardin navê Kurden di rûpelêñ rojnaman de derdi Kevin manşetan. Helbet sedemê vê yekê ew e ku CIA û MIT di pişt vê propagandê û dezînformasyona qirêj de ne. Türkiye temamê serweta xwe û bidana nikarîbû fîşsetek

Dûmahîk di rûpelê 6'an de

Ji bo haziriya îşxala Kerkük û Mûsilî


Türkiye bi dizî seferberliga qismî ilan kir

- Elçiye kevn Nûrî Eren, "Elçiye NATO'yê pêşniyar kir, ku Türkiye bira Kerkük û Mûsilî îşxal bike" û got, "wê Türkiye li karê derkeve."
- Generalê kevn Turgut Sunalp, "Eger ku Amerîka bixwaze îşxala Kerkükê wacib dibe."
- Tirkîye bi dizî qismî "seferberlik" ilan kir.

Piştî gurbûna şerî Iran û Iraqê Tirkîye jî dest bi hin haziriya kir. Di 1'ê Sibatê de Konseya Parastînê ya Mîli (Millî Guvenlik Kurulu) bi serekkomar Kenan Evren, serokê Erkanî Herb orgeneral Necdet Uruğ û Serekwezîr Turgut Ozal re ceviya û li ser rewşa da-wî sekinîn. Li gor hin çavkaniyê dîplomatîk di vê civînê de mela esasî netîca şerî Iranê û Iraqê û îhtîmala îşxala Tirkîye ya Mûsil û Kerkükê ye.

Li aliye din, Elçiye Tirkîye yê kevn ê Çinê Nûrî Eren di axafînek xwe de ji devê Elçiye NATO'yê van gotinê jérin got: "Bi îşxala Kerkük û Mûsilî wê Tirkîye edî ji destvekikina li ber NATO û Amerîka xelas bibe. Ü di warê aborî de ji wê li herêmê hakim be. Wê li Iraqê rejimek Şîfi bê avakirin. Ü wê Bakurê Iraqê jî têkeve destê Kurda. Dibê Tirkîye pêrgiyê li van bûyeren ne xwes bigre û bi destura mafê heqêñ xwe yên kevn Mûsil û Kerkükê îşxal bike. Bi vî hawî wê Tirkîye bi qasî hewedariya xwe petrolê jî bi destê xwe xe."

Dûmahîk di rûpelê 7'an de



İdris Barzanî
Koç kir

Endamê Polît Buro ya PDK-I (Partî Demokratî Kurdistanî Iraq), roja 31' ê Çilê Paşî ya 1987'a, di 43 saliya xwe de ji ber rawestandina dil koça da-wî kir.

Li ser mirina İdris Barzanî, Polît Buroya PDK-I roja 1' ê Sibatê beyanek resmî belav kir. Beyan wisaye:

"Berpîrsiyarekî Polît Biro-ya Partî Demokratî Kurdistanî Iraq, bi dilek pir êş û keder diyar dike, ku xudê

Dûmahîk di rûpelê 7'an de

QEREJDAX:

Nexweş li ser darbestan dimrin



Vê pîreka nexweş wê li ser darbestê riya 7-8 seetan bi peyati bibin Wêranşarê

- Ji sala 1981'ê û virde bes ji gundê Qarînê 24 pîrek di riya nexweşxana Wêranşarê de mirin.
- Hetanî iro bes ji Qûncaesmê (gundekî 30 mal e) 30-40 pîrek di ber zaruyê de mirin.
- Pîrekê me ya bi emrê xwedê zaruya tînin û ya jî dimrin.

Qarînê Çûva gundekî Qe-rejîdaxê ye û bi xwe jî muxtarî ye. 18 gund (mezre) girêdayî muxtarîya Qerînê ne. Navbera Wêranşarê û van gundan 30-40 kilometre ye; lê riyek

baş, ku havîn û zivîstana bixebe tune ye. Dema berf dikeve û dibe silî ü şepelî rê tê girtin û têkilî bi carê de ji ba-jîr qut dibe. Terşen wan bimre, nexweş wan hebe, ci dibe

bira bibe, rê girtî ye û bi tu hawî nikarin xwe bihgînîn bajêr.

Ji van gundan li yekî jî ne

Dûmahîk di rûpelê 7'an de

Pêşmergan destê xwe dan hev: LI HEWLÊRE HEZÊN DIJMIN ŞIKANDIN



Roja 12'ê meha 11'an qeweteka mezin ji serbaz û hukûmetê li Hewlêre êrîşî ser navça Şimanik kirin. Êrîşa dijmin ji çar aliyan ve hat. Ya yekê ji Hewlêre ber bi gundê Xez-na, Tircan, Sîrawa û Siyaw bû. Ya dudyan ber bi gundê Mastawa û Siyaw bû. Seet di 9'ê sibê de li Hewlêre le herêma deşta Heş di navbera pêşmergên Partiya Sosyalîst, pêşmergên Yekîti Nişîman Kurdistan û hêzên rejîma Seddam de çebû. Ji aliye sisîya ve ji, quwetê dijmin ji bajarê Guwêr ber bi gundê Elî Mele Dawût, Ewêna û Şêx Şerwan ve hat. Li vir, destê sibê şerekî mezin di navbera hêzên dijmin û pêşmergên Partiya Sosyalîst yên herêma Qeroçox û pêşmergên Yekîti Nişîman Kurdistan de destpêkigên her du hêzan, bi mîranî li ber xwe dan û zora leşkerên Seddamê xwînmê birin. Êrîşa ji aliye çaran ve ji, hêzên dijmin ji Hewlêr ber bi gundê Girdaziba, Ali

Dûmahîk di rûpelê 7'an de

Nezanîbûn na, lê fîrnebûn gunehkari ye

M. Eli

Ordîa Tirk, gava serdestiya xwe li Kurdistanê dimeşîne, ne bes di riya zulm û zordariyê re, lê her wiha di riya propaganda dezinformasyon, mejîşustin û manewiyat xera-kirinê re jî li kar û bar e. Di vê propagandê de awayê fêde jê girtinê yek jê jî bikaranîna belavok û ilanê destâne ku bi zimanekî sivik têr nivîsin û di nav gundiyan de têr belakîrin. Di belavokên wiha de bi derew û bêbextiyen kar û barê qirêj dixin hustuyê hêzên Kurd, li dijî tevgera rizgarîwaziya Kurdî propaganda di-kin, dixwazin wan li ber çavê gundiyan Kurdistanê reşbi-kin, bi hedîs û ayetan ban gundiyan dikin ku li dijî tevgerê têkevin "cîhada muqeddes". Carna jî Kurd û Kurdiyê nîzim dixin, Tirk û Tirkîyê li ber çavê wan bilind dikin, xwe dikin damezrêner û hamîyê şaristaniyetê.

Cendekî berê, belavokek bi vî rengî ket destê min. Gava min wê xwend gelek li telê min ket. Lî piştî ez li ser hineki fikirîm, min dît ku gelek mixabin hin heqîqetên me jî din bin gehêj ji propagandê wiha re.

Belavok li ser mesela ziman disekinî û dixwest bide xwi-yakirin, ku her çiqas hin kes an hêz doza "Kurd" û "Kurdiyê" dikin jî lê jî ber ku zimanekî Kurdî yê literatûrî yê pêşketi tune ye, ev zimanekî prîmîfîf (iptida-bidai) nav malê ye, ew di belavokên xwe de zimanê Tirkî bikar tînin. Belavokê wiha digot:

"Hemwelatî!

Li belavokên PKK yên li Ewrûpa beladibin binêrin, hemû bi Tirkî yan jî bi zimanê wî welatê lê dimînîn hatine nivîsin. Ji alîkî de dibê "Kurd" û dixwazin eşîrên Tirk ên Anadola Rojhilat û Rojhilatê Başûr ji me perçebikin, ji alî din de di belavokên ku beladikin de ji Tirkî pêştir zimanekî bikarnayin,

nanîvisin. Ma ev xerîbî (neli-hevî, ecêbî) bala herkesi na-kişine?

Gelo di rastiyê de binavê "Kurdî" tu ziman tune?

Yan heye, ev cudaxwaz nizanin?

Gelo elfaba wî tune ye, ku nikarin binîvisin?

Lê na gelo ew bêyî hay lê hebîn ku ci dikin bi zimanê te yê zikmaki yê Tirkî, mecbûr di-kin xîtabî te Tirkê heqîqî di-kin?"

Erê rast e, ci kes ci jî hêz: em hemû Kurdên Kurdistanâ Tirkîyê belavok, pirtûk û roj-namên xwe bi Tirkî çapdikin. Helbet van dehsalén dawî hin pirtûken Kurdi jî çapbûn. Me destpêkiriye carna em belavokên xwe bi Kurdi derdixin û çend rûpelên rojnamên xwe vediqetîmin jî bo zimanê Kurdi jî. Lî em xwe pê nexapînin ku bi vê yekê her tişti diqede. Gava em rastiya xwe bidin ber cav xwiya ye ku weşanên Kurdi û nav çapmeniya tevgera rizgarîwaziya Kurdî de, gelek kêm e, hê di qonaxa sembolikîyê de ye. Propaga-danda û ajitasyona me ya li hemberî dijimin xwe hînkîrin û xwe gîhandina me bi tevayî di riya zîpanê Tirkî re ye. Em bîr û baweriya rizgarbûnê, ya hisyarbûna netewî bi Tirkî dighînin nav milet. Wer li me hatiye ku em bi Tirkî difikirin, bi Tirkî dixwînîn û dini-vîsin, hestê (hisâ) xwe bi Tirkî didin der. Erê miletê me di jiyana xwe ya rojane de bi Kurdi dide û distîne. Lî xwendin û nivîsandina Kurdi ne ku di nav gel de hî û nav tevgera rizgarîwazi de, hî û nav kadroyê hêzên siyasa de pir û pir kêm e. Li vî perçê welat 15 milyon nifûs in, hejmara yê ku bi xweskayî karibin bi Kurdi bixwînîn û binîvisin nagîhe hezaran.

Helbet ev yek, ne jî bela ku zimanê Kurdi tune, bê alfabe ye yan jî bela prîmîfîf e bi kêt nayê. Na, gelek sedemîn din hene ku zimanê me yê şérîn û

pê re jî miletê me xistiye vê rewşê sedemê herî pêşîn, si-yaseta şovenî ya kolonyalist a Dewleta Tirk e. Karbidestiya Tirk, welatê me xistiye bin nîrê zordestiyê, xwendin, ni-vîsandin û axaftina Kurdi qedexe kirîye. Navê Kurd û Kurdistanê ji holê rakiriye, bi darê zorê herkesi dike "Tirk". Heger meriv xwedî li Kurdiya xwe derê, meriv nikare li Tirkîyê biji. Ji bo ku meriv bijî dibê "Tirk" be bi kêmâsi "Tirkê Çiyayı" be.

Hîndekariya dibistanê, ji destpêkî heta dawiyê bi zimanê Tirkî û naverokek şovenî ya kevneperest e. Radyo televîzyon, rojname û pirtûk hemû bi Tirkî ne. Em Kurdên Kurdistanâ Tirkîyê, ji 6 saliya xwe destpêdikin di riya zimanê Tirkî û siyaseta kevneperest re dînyayê nasdikin. Zimanê Kurdi (ew jî ku em jî bir nekin) ji me re dimîne wek zimanê malê yê jiyana rojane ya basît. Piraniya miletê me (ji % 70'yi zedetir) nextwendî ye, ci bi Tirkî ci bi Kurdi nikare bixwînê û binîvisse. Erê bi Kurdi diaxivin lê gava rojname, belavok an pirtûkék Kurdi dikeve destê wan, tu tişti jê fam nakin nikarin bixwînîn. Yen xwendî jî % 99 û wan ne alfaba Kurdi, ne jî pirtûk û rojnamên Kurdi dîstîne, gava dibîni, ew jî nikarin bixwînîn.

Xwendin û nivîsandina Kurdi li ser milê însiyatiya şexsî maye. Şexsîn ku vê însiyatîfî girtibin destê xwe jî gelek kêm in, hema hema bi tiliyîn destan têr jimartin. Hêzên siyasi û ronakbirêñ tevgera rizgarîwaziya Kurd mesela hînbûn û hînkîrina zimanê Kurdi helbet ne súcme ye, lê fîrnebûn û bi der û dora xwe fîrnekirin û nemeşandina programekî di vê riyê de gunehkariyek mezin e. Helbet şoreşa welat, serxwebûn û azadiya Kurdistanâ, di esasî de wê rî li ber ges û gurbûna ziman, edebiyat û kultura me veke. Lî ev nayê wê manê ku divê em hînbûn û hînkîrina zimanê xwe bidin alîkî, bispêrin piştî şoresê. Divê em bi awakî wilô xwe pêve bijidînin, wek wê qet şoresê çenebe. Çimkî ne wiha be; hevîre her Kurdekî bi ruh û fikra Kurdayîtyê neyê hêstirandin, her ferdekî Kurd bi şerefa Kurdiyâ xwe serbilind nebe, şores jî zû bi ser nakeve. Ü hevîrtşê vî hevîrî jî zimanê Kurdi ye, ne tiştekî din e.

• NAMEYÊN XWENDEVANAN •

Bijî ARMANC bijî ên ARMANCE dijînin

Piştî şes sala, şes salê tarî, min bi zimanê xwe Armanca nû xwend.

Armanca a nû. Rojnama Kurdi.... Di bin cîzmî dîktatoriya faşîst de xwendina rojnamê, rojnama Kurdi çiqasî zor e û bi qasî zor e hewqasî jî xwes e. Roja min Armanca nû xwend, ez bûm wek çûkekî gêjê ji besta hatiye xwarê. Min wê demê dît ku ez çiqasî ji zimanê xwe dûr ketime. Cara pêşî, ji xwendinê min baş fehmnekir. Lî di cara duda de, hêdî hêdî hişê min hat serê min û kêfa min hat. Piştî şes sala, piştî şes salê tarî, rûres û bi xwîn; bi zimanê min çîrok vêket û çav û mejîyê min ronî kir. Ü

piştî şes sala, min bi zimanê xwe Armanca nû xwend!

Ji 12'ê Îlonê vir de, ji bela ku di pirtûkxana de pirtûkîn Kurdi tune ne û ên hebûn jî ketin binê erdê, loma jî xwendina Kurdi pir kêm bû. Her çiqas, her roj em bi Kurdi dipeyivin jî, lê çaxa xwendin û nivîsandin tune-be meriv nikare xwe û zimanê xwe pêş de bive. Ji ber vê yekê, meriv xwendin û nivîsandina zimanê xwe nizanibe wek marê nîvkuşî ye; içar tew meriv xwendin û nivîsandina Tirkî jî zanibe...

Hejmara Armanca a nû ket destê min.

Her çiqas ji bo ku meriv karibe bi firehî nîrîna xwe bibêje hejmarek hindik be jî, lê ezê cardin hin nîrîn û xwestinê xwe bini-vîsinim.

1—Mezinbûna rojnamê li gor sertî dervî welêt pir xwes e. Lî belê, ji bo we-lêt, ji bo şertî dîktatoriya

fâsist mezine. Hilgirtin û veşartina wê pir zor e, pir talûke ye.

2—Rojnama Armanca a nû bi tevayî xwes e, baş e. Lî belê, ji awayê nûçeyan ve pir kêm e. Pirê nûçeyan, berê di rojnamên Tirkî de hatine nivîsandin. Rast e, gerek ew nûçe jî di rojnamê de hebin. Lî belê, ew nûçe li gor vir pir "sivike" merivî li vir rojname xwendin, pirê wan li ser vî tişti sekinîn û gotin nûçeyen nû, interes pir tuneye.

3—Hevpeyîn pir be ewê bas be; li gora min. Bi partiyê welatên din, bi ronakbirêñ welatê din re hevpeyîn hebe ewê bas be. Mese-la, bi ê Şîlîyê yan jî bi ê weletekî din re...

4—Di rojnamê de, li ser meselê cîhanê, welêt û tişte din, karîkatur hebin; di her hejmarê de 2-3 helbesten hozanên Kurda hebin ewê bas be.

5—Li ser perçen din ên we-lât me jî gerek di rojnamê

de hinek giranî hebe. Li gor baweriya min, her meh rûpelek ji bo nûçen perçen dinê gerek hebe. Çunki ev welat ne perçe di bin destê Tirkîyê teneye.

6—Di qoziya "Dîrok û Em" de, ji hevkariya me û Érmeniya cihetir, dîroka Kurda jî bi firehî û kûrî karibî nivîsandin.

7—Hinek mervên rojname xwendin, ji alîyê zimên ga-zin kirin. Lî belê li gor min ev ne rast e. Ew mirovana dibêjin ku xwendina Kurdi pir zor e û pir wextê distîne, ji bo vê yekê jî bi Kurdi tenê ne baş e. Li gor min vana rast nafikirin. Eger em bi zimanê xwe nexwînin û nenivîsinin, emê zimanê xwe hêdî hêdî ji bir bikin. Ji bona em zimanê xwe pêş de bivin, em karibin tişte di serê xwe de bi Kurdi binîvisin, ji bo vê yekê Armanca nû, bi Kurdi tiştekî pir baş e.

8—Ji xêndî Armanca roj-nama "Kurdistan Press"

Stiriyen me

Bavê Nazê

EZ JİYANÊ Bİ ÇAVEKÎ DIN DİBİNİM

Ne bi derewa, ji mîj ve hatiye gotin: "Çavê li deriya, xweli li seriya." Dibe ji ber vê yekê ez şerm dikim, dema ku ez çavê xwe li ber deriyê "mala apo" pan dikim. Ez şerm dikim tevi ku xwendevan A.Rıza Alan vî heqî nade min, ji ber ku hemû kurdên li Siwêdê di vê riyê re derbas bûne. Ez maflî xwe di vî tişti de nabînim, li gel ku parsetkiya li ber deriyê "mala apo" ji geşta qereciyan û ji tayîna fe-qan bilintir e. Heqê parsekî hebû wiha gazindan bike: "Bi tenê bextê me parsekan res e. Qereci ji wek me parsekiyê dikin, lê navê ya wan geş e. Ü feqe ji navê tayînê li parsekiya xwe dikin". Heger rebêne Parsek, hinga rewşa Kurden li Siwêdê bizaniba wê gotiba: Kurden me yîn li Siwêdê ji parsekiya xwe bi navê "heq" vedişerin". An bi gotina iro, bi navê "normal û rewa"...

Bi xwe ez heqê xwe di vî tişti de nabînim, ji ber ku ez dizanim me tu kavir nefirotine siwêdiyan û sînorê me ji yê wan venaqete. Dibe ku hinek heqê xwe di vî tişti de dibînin, ev heq heqê wan e û xweziya min bi dilê wan!

Ü tiştekî din, yê ku di qorziqa -Stiriyen me- bala eyñ xwendevan û hinek din jî kişandibû, gotara "sal bi sal xwezi bi par" bû. Bi xwe min nedixwest û ez naxwazim ku gotin bi fetih û kesan bêne xwendin, lê diyârê ezê ji neçarı wê gunehkariyê bikim. Li ser wê gotarê loma ku li min hatiye kirin, ewe ku min xweziya xwe bi par anîye. Lomên wan büyerek anî bîra min ku di dema xwendekariya min de çêbûbû: Şagirtekî ji marmosta pirsî; "Ez fannakim, cilo yekî wek Lînen pêşverû, navê Gavek bo pêş du gav bo paş li kitêba xwe kiribû?" Hinek şagirt kenîyan û hinek jî bi cidî li bendi bersivê man. Li gora ku ez dizanim, pirê caran pêkenin bi riya çewtiyên wiha çedîbin.

Pirsin a ku di nama Rıza Alan de bala min kişand, pirsâ Kamîra û resim bû. Wî ji ku bîhistiye ku dema Kamîra derket, xelkê fikra rabûna resamîyê kir. Wî ji ku bîhistiye ez bi xwe nizanîm, belê ez jî dikarim bîbîjim ku dema balefir derketin, xelkê fikra rabûna pi-sîkîtê kir. Lî iro em dibînin, ku li welatê wek Siwêdê, jî mal tune ye ku hespa hesinî li ber deriyê wan ne tewilandî ye.

Cilo dilêma (wezîfe) balefir û pisiklêtê ji hev cida ye, wilo ji ya resim û foto. Ji ber vê yekê, kesî nefikirî ku ewê şûna hev bigirin.

Piştî nimuna foto û resimî an hunermendiyê Rıza Alan dixwaze li gora famkirina xwe, çewtiyê di hustiyê min xîne.

Bi xwe min nivisandi bû ku Sînorê jiyanê û hunermendiyê digihin hev û carna jî tevlîhev dibin. Eger xwendevan delal me na jîyanê bi foto fam dike, ev tiştekî din e. Ez doza fotokîşandinê di hunermendiyê de nakîm. Fotokîşandin çîqasî spehi be, nikare kerekterekî insanî xuya bike. Û min di nivisa xwe de gotibû ku divê xeliçe tiştekî pêş me ke... Kerekterekî. Afîrandina kerekteran, ci di edeb de, ci di resim de û ci di nehid de tişte heri giring û pêwist e. Bêyi vî tişti wê hunermendî nikaribe bi dilêma xwe rabe. Lî dema min doza zelaliyê di hunermendiyê de kiribû, nehate wê me'nê ku min doza fotokîşandinê dikir. Min dijî tevlîhev bûn û windabûnê nivisand, lê ne dijî kûrbûna di naverok de û aloziya di hunandina avayîya çîrok û xalîcan de, nivisandi bû. Belê divê hunermendî mina tiryî merzûna selâl be. Cilo zelalbûna di hunermendiyê de ne fotokîşandin, wilo ji tevlîhev bûn û hunermendiyê...

...Diyare Rıza Alan ji parsekiya "mala apo" xilas bûye û peren wî pir bûne. Ji ber vê yekê televizyon û pisiklêtê xwe ji min re bi re ke. Tevi ku kevnin jî ez qebûl dikim, bê henek û bi cidî ez wan qebûldikim.

Ü gotina heri heri cidî, bi rastî ez pir tarsiym ku Rıza Alan cendîrma bişîne ser redaksiyona armancê, ji bo çapkirina qorçika "stiriyen me." Diyare sira bayê dîmokrasiyê bi carekê nikare bayê diktatoriyê di nefsa insan de bîşkene!...

Ü gotina heri heri cidî, bi rastî jî redaksiyona armancê li kû bû, dema peyvîn: "Ma Bavê Nazê di kewarê de dijî" ji ber guhêne xwe berdan û peyvîn din jî.

Xwendevanê hêja bi xwe ez ne di kewarê de dijîm, ne jî di guhê gê de, lê ez jiyanê bi çavekî din dibînim.

ket destê me. Ên her du rojname xwendin, Armanca hîna pêştir dî-tin. Lî belê, hinek eleştiriye (rexneyê Ar.) wan jî çêbûn. Mesela, dibêjin, "Kurdistan Press" ji 15 roja carekê derdikeve, cîma Armanca ji mehê carekê derdikeve? Dibêjin, ji aliyê nûçe de "K. Press" hîn pêş de ye.

Li gor min jî hinek nûçe û hevpeyîn wê hîn xweştir e. Lî belê, politika û ilkê (Prensibê Ar.) Armanca û Kurdistan Press ne wek hev in. K. Press wek eşûrê ye. Ji her rengê cîhanê hinek heye. Nûçeyen wê pirayî sansasyonel e.

Eger em dixwazin Armanca nû pêş de here; em giş, ên li welat, ên li metropolê, ên li dervî welat, gerek em nama bişînin. Bi nûçe û nivîsandinê xwe em Armanca pêş de bivin.

Silav ji we hemûyan re

Bijî Armanca nû, bijî ên Armanca dijînin.

DÎLAN Mêrdin

</




KEVNEPERESTÊN AFGANÎ Û NARKOTÎK

Havîna 1986-an di rojnama San Fransizco Chronicle de nûçeyek li ser ticareta narkotik hatibû nivîsandin. Li gor vê nûçeyê li ser pakêtên xeşîşan "Afganistan" nivîsandibû. Daîra Têkoşin li dij Narkotikê gelek xeşîş bi dest xistibû. Dema rojnamevanê San Francisco Chronicle pisa Afganîstanê "ji nûnerê vê dîrê pîrsî, bersivek wiha girt; "Xeşîş ji Pakistanê bi destê gerillayê Afgani" hatiye şandin. Di navbera bazirgânê narkotikê dizî û gerillayê Afganî de tu ferq tuneye. Di eslê xwe de herdu ji yek in."

Piştî demek kurt polisên Hollandayê nêzî 220 kîlo eroîn bi dest xistin. Li gor polisên Hollandayê eroîn ji Pakistanê, nêzî sinorê Afganîstanê hatibû bi rî kirin.

Wisa xûya ye ku kevneperestên Afganî di herêmek pir mezin de xeşîş dicînin û bâkurê rojavayê Pakistanê (Sinorê Afganîstanê) kirine herêmâ xeşîş. Li gor rojnama Rolling Stones (rojnameyek Amerikî ye.) deşta navbera



KARKERÊN ZAROK

ILO (Rêxistina Karkeran a Navnetewî) di kovara xwe ya dawiya sala 1986-an de lêkolînek li ser zarokan weşand. Li gor lêkolîna ILO, di welatên Asyayê de ji karkeran %11 Zarok in û ev hejmar di welatên Afrikî %17 û di welatên Latîn Amerikayê de ji di navbera %12 û %26 de ye.

ILO çend sal berê ji lêkolînek li ser karkeren Zarok çêkiribû û li gor wê lêkolînê hêjmara Zarokên ku kar dikirin nêzî 50 mîlyon e. Lî iro ev hejmar nêzî 100 mîlyon e. Li gor hin pîsporan hejmara karkeren Zarok digihîje 200 mîlyonî.

Li gor lêkolîna ILO, di welatên paşdemayı de ev çend sal in ku giranî didin dibistanê û di van welatan de hejmara karkeren zarok roj bi roj kêm dibe. Li Afrikayê hejmara zarokên 6-11 salî ku di navbera sala 1960 û sala 1985-an de dest bi dibistanê kirin, du car zêde -ji %32,7 heya %65,9- bû. Li Asyayê di vê demê de hêjmara zarokên ku çûne dibistanê ji %54,4 heya %73,6 zêde bûye. Li Latîn Amerikayê ji %57,7 heya %83,5 zêde bûye.

Li gor lêkolîna ILO, zarok pîrr caran bi perekî pîrr hindik di karên giran de têxebitandinê. Nemaze di welatên paşdemayı de rewşa ku zarok têde kar dikin ne rewşike adeti ye. Zarok di ciyêن pîrr bi talûke de kar dikin. Ji vê yekê ji di qezakê de yêñ dimrin an ji seqet dimînin, zarok bi xwe ne.

Weki têzanîn li welatên paşdemayı zarok ji bo ku alîkariya dê û bavê xwe bikin pîrr zû



dikevin nav jiyana xebatê. Zarok bi pirranî di kiş û kal, atolye û xizmetên civakî yê hem netewî hem ji navnetewî derman bike û ev nexweşî ji bêkarî û feqîrî ye. ILO di lêkolîna xwe de giraniyê dide xwendina zarokan. Dema zarok kar dikin, karê mezina ji wan distinîn û bêkarî peyde dibe. Ji aliye din ji eger Zarok kar nekin malbatên feqîr wê ji qezencekê mehrûm û wê hejartir bibin.

bête rawestandin dê mirov bîkaribe nexweşîyê civakî yê hem netewî hem ji navnetewî derman bike û ev nexweşî ji bêkarî û feqîrî ye. ILO di lêkolîna xwe de giraniyê dide xwendina zarokan. Dema zarok kar dikin, karê mezina ji wan distinîn û bêkarî peyde dibe. Ji aliye din ji eger Zarok kar nekin malbatên feqîr wê ji qezencekê mehrûm û wê hejartir bibin.

Paraşînar û Çîtralê ku kampa kevneperestên Afganî lê ye, bi temamî bûye herêma xeşîş. Kevneperestên Afganî bi alîkariya hin pisporê Ewrûpî hê di sala 1980'êyî de laboratuwaran avakiribûn. Kontrola van laboratuwaran di destê Gulbedin Hîkmetyar de ye. Hîkmetyar ji alî nebaşa xwe pir bi nav û deng e û ji salâ 1960-an û vir de ajaniya CIA dike.

Lê belê kesê ku wek "qiralê eroînê" tê naskirin serek eşîr û kevneperest Seyid Ahmed Gilanî ye. Gilanî û Hîkmetyan bi riya Mafya eroînê û bi alîkariya CIA hev nas kirin û bi hevre li dij Komara Demokratik a Afganîstanê dest bi ser kirin. Karbidesten Pakistanî ji ji vê yekê agahdar in, lê belê dengê xwe dernaxin.

Kevneperestên Afganî salê navbera 700 an ji 1000 ton xeşîş dicînin û nêzî 20 Şirket ji van xeşîsan dikin eroîn. Li gor kovareke Hongkongî, Far Eastern Economic Review dê kevneperestên Afganî ïsal 13-15 ton eroîn çêkin.

ANC KET SALA 75'A



Serokê ANC Oliver Tambo

8'e Çileyê Paşîn 1987-an de ANC kete 75 saliya xwe. ANC di sala 1912-an de hat ava kirin û niha li dinê bi emirtirin rîxistin e.

75 saliya ANC (Kongra Netewî ya Afrika) li her aleyle dinê bi mitîng û teygeren din hat pîrozkirin. Di roja 8'e Çileyê Paşîn de gelê Afrika Başûr karê xwe berdan, xwendan ketin boykotê, dêr civînan pêkanî.

Di sala 1955-an de ANC û pênc rîxistinê din Deklarasyona Azadiyê beyan kirin û ji wê rojê vir de ev deklarasyon bûye bingeha siyaseta ANC.

ANC di sala 1960-an de hat qedexekirin û serekê ANC Nelson Mandela hat girtin. Niha serekê ANC Oliver Tambo ye.

Îro li Afrika Başûr UDF (Eniya Yekîti ya Demokratik) li dijî rejîma aparteist têkoşin dide. UDF milekî ANC ye û ji kêçeyên dêran, xwendevanan, jinan pêk tê.

ŞERÊ İRAN Û İRAQÊ QEZENCA EMPERYALİZMÊ YE

H. Mizgin

Şerê İran û Iraq ev şes sal in dom dike. Heya iro bi hezaran insanên bê súc hatin kuştin. Bi hezaran insan seqet man. Herdu dewlet ji destpêkirine zarakan dişinin cebhê. Herdu dewlet ji giraniya hatinê xwe yên netewî pêşkêşî tucarên çekan dîkin. Gelê herdu dewletan roj bi roj hejar û perîşan dîkin. Gelê kedkar û karkeren herdu welatan hem maddî hem ji manevî dewlemendiyê pir hêja winda dîkin.

Ne Iran û ne ji Iraq guh nadîn qâideyên navnetewî û bîryarê Netewîn Yekbûyi. Di vî şerî de bombeyen kîmyewî bikartînî. Èris didin ser ciyên ku xelk bi xwe lê dijin. Ji herdu aliyan ji jenoside destpêkirîye diçe.

Helbet tu qezenza gelê Iraq û yê Iranê ji vî şerî tûne ye. Ên ku di vî şerî de qezenc dikin hêzên emperyalist, kevneperest û siyonistin.

Ma şerê wiha nîn be wê emperyalist, kevneperest û siyonistin bi ci awayî çekên xwe bifrotina?

Hem DAY û Israîl û hem ji Erebistana Saûdî dixwazin ev şer dom bike. DAY ji bo domandina vî şerî bi riya CIA ìnformasyonê çewt dide herdu aliyan. DAY xwe wek dostê Iraqê nîşan da lê ji bin de çek firote Iranê. Suudi Arabistan û Israîl ji bo domandina şerî Iran û Iraqê ci ji dest tê dîkin. Ji hêzketina Iran û Iraqê li gor dilê Suudi û Israîl e.

Kurdistanâ me ji di vî şerî de bûye qada cengê. Gelê me bûye hedefa bomban, firoke û helikopteran. Herdu dewlet ji bi zorê dixwazin ku gelê Kurd di vî şerî de besar bibe. Bi rastî ev şer ji bo hêzên Kurda fersendek baş bû. Lê belê pir mixabin ku hêj hêzên me ne gîhiştine wê merhalê. Dijitiyên hêzên herdu perçen Kurdistanê, tunebûna yekitiyek netewî bûye bendek mezin li hember têkoşînê. Hêvî ew e ku hêzên herdu perçen Kurdistanê dijitiyê xwe ji hólê rakin û yekîtiya gelê Kurd bi rî xin.

Herçiqas Iran û Iraq di nav şerekî germ de ne ji dev ji pilangiriya xwe bernadin. Iran ji alîkî piştgiriya kevneperesten Afganî dike. Kevneperesten Afganî di nav Iranê de kampan ava dîkin. Çek û pere die wan. Iran bi xwe 60 car kete nav sinorê Afganîstanê. Ma gelo di vê tevgerê de ferqa Iran û DAY ciye? Wan rojan rojnama Wall Street Journal wiha nivîsandibû; "John Poindexter (Şefî Komîta Ewlekarî ya Netewî ya DAY û milê rastê yê R. Reagan bû-H.M.) eşkere kir ku yek ji hedefen firotina çek ji Iranê re ew bû ku rîkî din!) ji bo alîkî ya çekdarî ji kevneperesten Afganî re bête afirandin." Li gor vê rojnamê, çekên ku bi riya Israîl hatin firotin Iranê hinek ji wan ji bo kevneperesten Afganî bûn. Mesela Iran ji bo ku bikaribe 2008 roboten dijî debab-e-Tow ji DAY bikire şertê DAY qebul kirine û ji van robotan 100 heb teslimî kevneperesten Afganî kirine. Li vir bersiva pîrsa me dertê holê. Siyaseta hukumeta Iran bi van kirinê xwe xizmeta DAY û kevneperstan dike.

Îraq ji Iranê kêm namîne. Ji bo ku bikaribe zora hêzên Kurdistanâ bibe peymanen hov bi hukumeta faşist a Tirkîye re dike. Sinorê xwe ji leşkeren Tirk re vedike. Gelê Kurd bi zorê ji ciyê wan dike û berê wan dide ciyekî din. Lê xûyaye hukumeta Iraqê roj bi roj ji hêj dikeve. Eger Yekîtiya hêzên Kurdistanâ Iraqê bi rîkî erîni pêşde biçê û bi hêzên Iraqi re hevkariyek pêk bîne dê serfirazî ya gelê Kurd û gelê Îraqê be.

FİLM LI SER KUŞTINA PALME

Televizyona Sovyetê li ser kuştina Olof Palme filîmek çekir. Manusa (metnê) vî filmî nivîskaré bi nav û deng Georgiy Zubkov nivîsandiye. Film, roja 27-ê Çileyê Paşîn di Televizyonê de hate weşandin. Li gor texmînan nêzî 100 mîlyon insanî li vî filmê temaşe kirin. Navê film "Kê Palme Kuş?"

Di film de hevpeyîn bi rojnamevan û nivîskar Dieter Strand, Sekretêra Palme Inga Lena Wallin û sekretêre dewletê Jan Carlsson re hene. Artîstên Sovyetî ji bi hin gotinê Palme, şexsîyet û karaktera wî wek insan û siyasiyek pêşkêş dîkin.

SOP DIGIHÎJE CIA

Li gor Georgiy Zubkov kesê ku ji Palme hez nedikirin generalen Natoyê û Pînoşet bû.

Zubkov dibêje, "Olof Palme di pirsa Latin Amerikayê de li hember DAY bendek bû. Siyaseta Palme ya navnetewî generalen Natoyê aciz dikir. Kar û xebata Palme ya ji bo çekdaxistinê di dinê rolekî girîng dileyîst" Û bi vî hawî ew kuştina Olof Palme bi CIA ve girêdide.

Di film de qala Partiya Karker a Awrûpa (EAP)- partiyek faşist e) û Partiya Karker a DAY (Serekê vê Partiyê faşistê bi nav û deng La Rouche e) tê kirin. Herdu partî ji dijiminê Olof Palme bûn û gelel caran li dij wî hin tevgera çekirine û tim û tim li dij wî propaganda bê sînor ajotine.

Di filmê "Kê Palme Kuş" de Olof Palme, di nav tevgera karkeşen dinê de nûnerê reformist û milê rastê, lê ji ber ku hezkirenek wî ya kûr ji hemû miletên dinê re hebû û ji bo wan têkoşin dida, loma ji enternasyonalist tê naşandin.

O.L. VİLÇEVSKİ Ú KURDZANİ

Têmûrê Xelîl Mûradov

Di welatê me de tradisyonen kurdzaniyê yên baş hene. Di kurtasiya (dawiya) sedalsa 19'a de, di presa (çapemeniya) Rûsi de, li ser Kurda ú Kurdistanê çend xebatên nivîskarên cihê derketin. Di nav de rohilatzanê Rûsa yên wek V. Nîkitin, İ. Bérêzin, V. Dîtîl, V. Gordlevskî her wiha kurdzanen bi nav ú deng P. Lérx, V. Velyamîn-Zérnov, F. Şarmûa, Yustî, A. Jaba ú yên mayin hebûn. Tradisyonen Kurdzaniya Rûsi, ji bal rohilatzanen Sovyet ve bi eşkereyi hatin pêşdixestin.

İdi de salen 20-30'ı yên sedalsa bistan de, bajarê Lenîngradê bû navbendeke Kurdzaniyê ya wilo, ku Kurdzanen gelek navdar ên wek I. Sükerman, V. Kurîlov, O. Vilçevskî ú yên mayin destpêkirin lê xebitîn. Mijûlbûna alîmen Ermenistanê ú Gürçistanê ya bi Kardzaniyê ve jî, di pêşdeçiyina Kurdzaniya Sovyet de rolek mezin list. Erêvan bû navbendeke Kardzaniyê ya bin nav ú deng.

Di Kurdzaniyê de N. Mar xebateke bêwestan kir. Bi saya wî ú I. Orbêlî di yekitiya Sovyet de koma Kurdzana hat sazkirin. Di ver de her wiha ji civaka Kurdan ên wek Hecîyê Cindî, Eminê Evdal, Qanatê Kurdo li ser pirsên dirok, edeb, çande ú zimanê Kurdi di xebitîn.

Kurdzanen Sovyet guhdariyek mezin didan şerkariya tevgera rizgarixwaziya milî, ji wana, M. Lazarêv, Şekroë Xudo (Mihoyî), M. Hasratyan hêjâyî bîranîne ne. Tevi vê yekê, li ser problemen etnografiya Kurdan ú her wiha li ser pêşdehatina (xulqardina) Kurdan ji tê rawestan. Di vî karî de keda Kurdzana Aristovayê ú S. Bruk gelek e. Di nav karê Kurdzaniyê de Profesor O. Vilçevski xebatek giranbiha kir.

Doktorê ulmê dirokê Olêg Lyûdvigoviç Vilçevskî keder mezin kire nava kurdzaniya Sovyetê. Ew li ser pirsên dirokê, miletzaniyê, zimanzaniyê. Literaturzaniyê (edebiyatzaniyê) ú çande kûr rawestî. Xebatên wî di nava kurdzaniya Rusya ú Sovyet de qonekek nuh vekirin.

O. Vilçevskî, bi taybeti, guhdariya mezin danî ser lînîhêrandina pêşdehatina Kurdan ku heta wî çaxî rind nehatibû lînîhêrandinê ú azunûkirina wî bi gelek dijwariya ve girêdayî bû. Ew bû şagirtê akademik N. Mar ú pêşdebinê xebata wî. Dawiyê, bi saya zên û marifeta xwe, ew hîni zimanen îngîlîzî, Almanî, Faransî Farisi Kurdi, Tirkî ú Erebî bû, pêre ji nasina xwe da çend zimanen din, cedand ku zaravân Kurdi yên din jî hîn be, Destpêkir baş hîn zimanê Kurdi be, hema hema her sal diçû li wan navcén ku Kurda tê de hebûn tevi xebat ú lêgerîven folklor dibû.

Ji sala 1928'a pêve O. Vilçevskî çend salan di Instituya Zimanen Rohilat yên zindî de dersen zimanê Kurdi da.

Wi têriya N. Mar a di derheq wê yekê de ku Kurda kevnîrîn bîneciyan wê herêmê ne ku niha li ser dijin û berê li ser wî erdi ji bilî

Kurdan kes nemaye, pêşdebir. Li gor vê teoriyê pêşdehatina Kurdan bi Kardûxên Ksenofon ve dihat gîrîdanê. N. Mar nêzîkayia têrîmîn "Kurd" ú "Kardûxî" kir hîm argumenteke téza xwe ya ku Kurda bi genetikî divê biniceyîn Asya Biçûk ên kevnare bin. Ev téza li ser pêşdehatina Kurdan ji ali rohilatza ve bi fireti hat qebûl-kirin, ji ali gelekan ve hat pêşde-xistin.

O. Vilçevskî qîmetek mezin daye keda N. Mar a nav Kurdzaniyê. Wî nivîsiye: "Ji ber gelek xebatên N. Mar ên li ser Kurdan ú zimanê Kurdi, Kurdzani minetdare wî ye. Xebatên usa ku me mecbûr dîkin em N. Mar wek zanakî vê pîrsê yê heri baş hesab bikin, ka bi lînîhêrandinê xwe ve çend deh salan pêşya ulmdarê Ewropayê gîhastîye wê derecê."

Lînîhêrandinê Vilçevskî, mecal dide me bi rengeki gelempêr em bêjîn, an jî bîn ser wî fikrê ku di dewrana sedsalen navin de, li Asyayê zimanê Kurdi di nava zimanen gelên mayin de rola xwe listiye.

Rast e, teoriya N. Mar ji ali çend Lînîhêrandinê Kurda tevgera rizgarixwaziya milî, ji wana, M. Lazarêv, Şekroë Xudo (Mihoyî), M. Hasratyan hêjâyî bîranîne ne. Tevi vê yekê, li ser problemen etnografiya Kurdan ú her wiha li ser pêşdehatina (xulqardina) Kurdan ji tê rawestan. Di vî karî de keda Kurdzana Aristovayê ú S. Bruk gelek e. Di nav karê Kurdzaniyê de Profesor O. Vilçevski xebatek giranbiha kir.

Problema zimanê Kurdi yê Lîteraturî tebatî nedîa O. Vilçevskî. Mesela ku malbendên Kurdîtiyê li nav Sînorîn çar dewletan (Iran, Iraq, Sûriye, Turkiya) ku welatê Kurdan di nav hev de parvekiriye, tesîra xwe li ser zimanê Kurdi, dirok ú literaturâ wê hîstîye. Ji bo vê yekê, ji alîkî ve biniceyîn wan her çar dewletan ên Kurda teşira mîleten serbet li ser zimanê xwe his dikin, ji alîkî ve jî hukmê xwe li ser zimanê wan mîletan dihêle. Gelek caran, pîrsa sazkirina zimanê Kurdi yê nivîsanê derketiye pêşya ronahîdanê Kurdan, zimanekî usa ku ji bo hemû Kurdan fîmîdar û destdayî be. Lîteratura Kurda ya nuh li ser hîmê wan zaravân Kurdi yên ku literatura Kurdan ya qîrnê navin bûn, dihat sazkirinê.

Di vê demê de gelek zimanen li ser wî fikrê ve ku literatura Kurdi li ser hîmê du zaravan pêşde dije: Kurmanciya ku ji bal Kurden Turkeye, perçek e Kurden Iranê ú Iraq ú her wiha ên Sûriye ú Sovyetistanê ve tê xeberdan, ú bi zaravân Soraniya ku piraniya Kurden Iranê ú Iraqê pê dipeyivin. Lî devê em zaravê Zazaki (dimbili) ú ên Kurdiyê mayin jî ji bîr nekin, ku ji wan herdu zaravan cihê ne. O. Vilçevskî ku rind di mesela

dijwariya sazkirina zimanê Kurdi yê hem literaturî ji bo Kurden Kurdistanê gîhastibû, ji bo sazkirina zimanê literatûri yê paqîji bo Kurden Sovyetistanê geleq qewet û ked xerc dikir. Di Kongra Kurdzaniyê ya pêşin de (s.1934'a li Erevan) O. Vilçevskî ku kivşê ku bi saya testîqkirina qeydîn Sovyetiye li wan ciyênu ku Kurda dijin, bi saya siyaseta lenfîniyê ya miletiyê, pêşdebirina literatûra Kurdi serecemeke nuh sitand. Ji dawîya salen 20'ı û bi vir de, destpêkir literaturâ bi zimanê Kurdi hat weşandîn. İdi de salen 30'ı de li hemû malbendên Kurden Sovyet de, xebata ronakbîriyê ya mezin dihat kîrîn. Kurda bi hemû gelên Sovyet re teví avakirina sosyalizmê bûn. Lî ji ali zelalkirina problemen zîmîn de dijwariyîn têrîkî pêşde hatin, ji ber ku kêm li ziman û zaravân Kurdi hatubûn nîhertin. Di Kongra Kurdzaniyê ya hemtifaqiyê de, pîrsa di derheqa hilbijartina varyanteke zimanê literatûri yê usa hat lînîhêartinê, ku payê pirê gelê Kurda tê digihîst.

Kongré bi yekdîngî biryar girtku, zimanê Kurden Ermenistanê, ji bo sazkirina zimanê Kurdi yê literaturîyê yekgîrti, wek hîm bê helbijartın. Çimkî ji berê de bi zimanê Kurden Ermenistanê idî hînek literatûr hatibûn çapkirin û ew ziman nêzîkî çend zaravân Kurden Kurdistanê yên gîring bû.

Her wekî ku O. Vilçevskî texmîn kîriye, di literaturâ Kurdi de folklor wê roleke berbiçav dilize. Wî nivîsiye ku zargotina Kurdi bi kemalâ xwe efrandinê wê civakî ya bê hempa ye. O. Vilçevskî bi xwe çend nimûnê folklor Kurdi berhev kîrine, wek nimûne, sitrana Budyonnîda. Wî ev sitiran sala 1927'a ji zarê (devê) Kurdeki ji dora Wanê gîrtiye. Ev sitiran di salen têkoşa Ordiya Sor a ji bo tesdiqkirina qeyde Sovyetiye de, li Piştakvare xuliqiye. Tê de hîzîkirina ber bi Lenînî mezin, Budyonnî û bolşewîkan de hatiye diyarkirinê.

O. Vilçevskî poêma "Mem û Zin" ji ber nivîsiye, wergerandîye Rûsi û di berhevoka "Cirokên Gelên Rojhîlatê" de (s.1938'a) daye çapkirinê.

Ulmdarê mezin gava dest bi izgerîye heykelên Kurdi yê edebiyatê kîrin, pîrs danî pêşya xwe, ku li destnîvîr Kurdi yê qedîmî (kevnare) binêre. Ji bo lînîhêrandinê Kurdistanê ya bi her alî û ji bo zargotina Kurdan a dawlemdîn, qîmeta vê yekê ya gelekî bilind hebû.

Pirofesörê şîrhal, her wiha bi pîrsa xulqandin û pêşdeçiyina Ézidiya ve jî bîliyaye. Ew jî li ser wî bir û baweriya N. Mar bû, ku dinî Ézidiya ew dinê ku parçekî Kurdan e, ew dinî berî ku ew dinê İslâmê qebûl bikin di nav de hebûye. O. Vilçevskî, ku destpêkir bi dinê Ézidiya ve mijûl bû, pîrsa kifşkirina wekhevûn û cihîtiya di nava dinê İslâmê ú Ézidîteyê de da ber xwe. Bi vê temaya, wî di Instituya Ziman û Fikrandinê ya Akademiya ilmî ya

Yekitiya Sovyet de bi têza "Varanta duakirina Ézidiyan a nuh" (1935) û ya "Oçerkedî derheq pêşdehatina Ézidiyan de" û çend din ve derket holê. Piraniya argumenten di derheq pêşdehatina Ézidiya de me tînin ser wî fikrê, ku ferqek mezin di navbera Ézidiya û tamamîya mirovîn mayîn de heye. Ên ku dinen dihebînîn Ézidiya bi vî awayî qebûl dikin, Wekî "dîn wan ji dîn tevâya mirovîn mayîn tê cihîkîrinê, ku xudayê wan ne xudayê cînarê wan e, nexwe ew xuda seyan e, lê Ézidi ji xizmetkar û alîgîre wî ne" Vilçevskî dibêje ku "Ev gotin, helbet ji nezaniyê tê."

Ji bilî van O. Vilçevskî di derheq Kurdan de gelek makalên zanyarî nivîsine, her wekî "Mar û Kurdzani", "Materyalîn di derheq Gramatika Kurdan de", "Di derheq dîroka terîma "Kurd" de", "Di Iraqê de pîrsa miletiyê" ú.h.wd.

Sala 1944'a pîrtûka O. Vilçevskî ya bi navê "Kurdên Başarê roavayê İranê" ronahî dît. Ew ji ali mîletzînîya Kurdi de xebatê bi qîmet û hewaskar tê hesibandin. Kitêba wî ji bal Orîantasyîn Sovyeti û derve ve bi dilovanî hat qebûl kîrin.

O. Vilçevskî, her wiha di derheq hîsîyanî û heyanetîn Kurdistanâ İranê de, di derheq hîwa wê, çem û biniceyîn çend navçen wê de gelek material berhev kîrine. Gelek xebatên usa nivîsiye ku li ciyênu ku Kurda lê dijin wan ji mîleten din bi karekter û xusûsiyeta xwe ve didin cudakirin. Wî cubâna zimanê Kurdi li hember zimanen din, erf adetên wan û ên mayin daye kivşê. Ferqiya di navbera Kurda û gelên mayin de li diji asimîlekirina Kurda aségîhîn mezin peyda dikin ku ew di nav Ereb, Tirk û Farisan de nevlin.

Wî ji weşanen (presa) Kurdi her wiha programa partiyen siyasi wergerandîne ser zimanen biyani. Ew rind hay ji presa Kurdi hebû.

Awirdan û gurbâna têkoşînên rizgarixwaziya milî ya Kurda yê salen 40'ı û her çar perçen Kurdistanê ji li derveyî guhdariya O. Vilçevskî nema. Bi nêzîkî nasiya xwe da rewşa Kurdan a wî çaxî. Lî qasî ku pîrsa di derheq pêşdehatina Kurda tebatî û didayê, tevgera rizgarî xwaziya milî ya Kurdi û problema literatûri ne ewqas bûn. Ew di temâniya jiyanâ xwe de bi vê problemê biliya û di derheq vê yekê de monografiyek bi sernîvisara "KURD" (sala 1961'ê nivîsî).

O. Vilçevskî xebatek pedagojik a mezin kîriye. Wî çend salan di Universîta Leningradê de û İnstîtuya Zimanen Rohilatê yên Zêndî (jîndar) de dersen zimanê Kurdi dane, lê paşê dersen di derheq dîroka Kurda û Kurdistanê de daye xwendin.

O. Vilçevskî sala 1966'a çûye ser heqîya xwe, lê mîrasê wî yê ilmî yê ku wî li pey xwe hîstiye, di nava Kurdzana de xwedî rûmetek giranbuhe ye.

Bîranîn Genialektî

Tîrk

- 8 -

Cemal Madanoğlu
Wergê: Alişer

— Belê ez benî.

— Niha baş bala xwe bide gotinê min! Dê tu seroktiya serbazê tabûrê biki.

— Ser seran...

min da xwe ku ez derkevîm...

— Bisekine xelas nebû...

Ez sekinîm.

— Got, tu serbazê qışlê yî û gotinê xwe domand. Celal Yuzbaşî got; giş ciyênu ku esker radikevin, qerargeha tabûrê, bingehêne eskerî, bi her awayî tişten wan ve berpirsiyaren wan tu yî. Fermanberê qerargehê ji tu yî. A çaran, serbazê inzîbatan ji tu yî...

— Ser seran...

— Xelas nebû, fermanberê qereqola derî ji tu yî.

Heta wextî, min tiştekî wek fermanberî ya qereqolê sehne-keribû; lê wextî got ez têgîhiştîm; mijara gotinê, deriyê li ser sînor bû.

— Celal Yuzbaşî:

— Dê, neha here...got.

Fermanariya tifingên makîne û li derveyî vê, fermanariya qerargehê, fermanariya qışlê, serbazîya inzîbatan, fermanariya qereqola derî, giş li ser hev şeş wezîfe.

Pêşî min pîrsî:

— Qereqola derî li ku ye?

— Nîv saet di pêş de ye, di sînor de ye...

— Bi piya mirov dikare here?

— Mirov dikare, mirov dikare bi hespê ji biçe.

Bi piya herim û der û doran ji bibînim...

Ez meşiyam.

— Qereqola derî ci ye?

Singek telefonê ya kevin dîtine, kevirek bi serê wê ve girê-dane, wexta ev sing radibe û rûdinê, sînor dixebe. Mangek li rexî singê û di maleki ax de cikirine. Mîlek din ya singê de di qulubekî heresiye ya derewîn de heresek bi xencer...

Qereqola derî ev e. Min melhezê kir.

Ez neha fermanberê boluka duduyan im. Fermanberê Tabûrâ Celal Yuzbaşî, "ji min, te ji bo çi Boluka duduyan teslim girt" pîrsek wisa nekir. Ji ber ku, Refîq Yuzbaşî li wir dimîne. Ji bo ku, herdu ji Yuzbaşî ne, di vê mijarî de nexwest aloziyek derxe. Min ji boluka duduyan mangek bijare anî. Danî ber derî. Min emir da çawşû:

— Hemû boluk dê li wir bixebe...

Piştrey min bi firehî pê da famkirin. Hem xanî û hem ji quube, me ji nûve sererast kir, temîr kir, kîsil kir. Me zîvîrand rewşekî wisa ku mirov dikare li ruyê wê binihêre. Me singa deriyê sînorê guherand. Di navbera çend rojan de, hemû tişt bûn wek gulê.

— Qabloya telefonê heye?

— Heye.

Min telefonek ji li derî da girêdan.

Me tecrûbe kir, pê tê axiftin.

Deriyê sînora Cizîrê, vedibe Sûriyê. Sûriye di wan wextan de, di destê Firansizande ye...

Berê, wexta serbazê Firansizan hatiye, yên me, bê ku tiştekî jî bipirsin

Kurmanciya naylon=Elîte naylon

A. Riza ALAN

Ez do-na-pêr li Diyarbekirê bûm. Ji Balıkçilar Başı (Rehmetiyê Mele Evdul-Kerim bûya, wê bigota "Serê Masiyan". Ji "kuşbaşı" re digot "serê çivikê". Lî têkoşin Osman? Yanî kekê Osse? Gelo ew li vêder buya wê ci bigota? Ez baş zanim wê negota "Balıkçilar Başı"

Ez li kuderê mabûm? Ji Balıkçilar Başı ber bi Ulu Camiye ve dimesiyam. Li ber Belediyê rastî M. Botaniyê Diyarbekirî hatim. Ez wî nasnakim. Ew jî min nas nake.

Lê li Diyarbekirê ji bo ku meriv çayekê bi yekî bide vexwarin ne şert e meriv wî nas bike.

M. Botan da pêsiya min û em cûn Qehwa Ulu Camiye. Du qehwa Ulu Camiye hene, em cûn ya nêzîti Belediyê.

Qehweka bi hewş e. Di nav hewşê de hewzek heye. Tasek siffrîn, bi rézilek hesinî ve gi-redayî, li ser dîwarê hewzê ye. Rêzîl ji tasê deh car girantir e.

Em li kéléka hewzê rûniştin. Hecî Ehmed, Xalê Ezo û Fero li tenîsta me rûniştine bi damê diliztin. Çend kes jî temâşa wan dikan.

Garson çayêne me tîne. Garsoneki ji wî biçuktır "boşen" xwe berev dike. Zilamek desmala xwe derdixe li ser masê radixe û dawî quitiya xwe ji berîka saqo dertîne tutûna di navê de vala dike ser desmalê û dest pê dike yeko yeko dari-kên wê ji nav dineqîne.

Zilamek din jî vî karî li ser pişta şewqa xwe dike.

We bawer nekir? Na, ya genç ew e ez rastiyê bêjim:

Ez ne do-na-pêr, ne par, ne pêrâr, ne betir pêrâr, ne jî betir betir pêrâr li Diyarbekirê bûm.

Çiroka M. Botan, "Dame, Hecî Ehmed û Fero" ez birim Diyarbekirê. "Qehwa Biçük" nehat bîra min, ez cûm Qehwa Ulu Camiye, li wêder jî bi damê diliztin, wextekî..(l)

Çima carna çirokek ev çend kin meriv dibe Diyarbekirê? Çima carna bi kilometroyan nîvis meriv nabîn tu derî?

M. Botan bi zimanê xelkê dipeyive. Bi xelkê re, û weki xelkê dipeyive. Di çiroka wi de yek kelimeyek heye ku (ne emîn im, lê texmîn dikim) di zimanê Diyarbekriyey de tûne "kelîma "nemaze". Wekî din çirok giş bi zimanê xelkê hatiye nîvisandin.

Ev çirok bi serê xwe iştbat dike ku zimanê xelkê têr û serterâ nîvisen edebî dike. (Ez zanim, hînek kes dibêjin têr nake. Gelo baş fikirîne? Zimanê kurmancî têr nake, yan ew têr nakin?)

Rast e, di vê çirokê de çend gotinêne erebî, farisî û turkî hene. Lê ci dibe, dunya xera dibe?

Gelek gotinêne zimanêne din di nav kurmancî de heliyanê, bûne malê xelkê, ji aliyê bi milyonan kurmanc ve têr peyivandin. Mesela, gotina "muşterî". Ne bi kurmancî "muşterî".

ye. Dibe ku yek ji me rabe di sûna "muşterî" de gotineke din çêke (eger ji nuha ve ne-hatibe çekirin). Tiştek wek "timîhat" an "timîkrox".

Ji xwe ne li Stockholmê ne li Parisê ne jî li Berlinê Qehwa Ulu camiyê an Qehwa Biçük tune. Em dikarin bêjin heta ku xwediyê gotina "timîhat" li Ewrûpayê be, ew ê di nav hevalen xwe de an di çirok û helbesten xwe de bikaribe bêje "timîhat".

Lê ku rojekê riya wî bi Diyarberk bikeve, gelo ne şerm e ku ji xwediyê Qehwa Biçük re bêje: "Iro timîhatiye te kêm in ha!" ?

Min gotina "timîhat" nuha li ser masa xwe çekir. Bi hezaran kelîmen weha li ser masen gelek cameran çebûne.

Li quisûrê nenihêrin, ez dixwazim piçekî behsa diya xwe bikim.

Ez çûbûm malê. Pişti hatina xwe ya Swêdê min diya xwe nedîtibû. Pişti çend rojêne se-rî, yanî pişti ku mevanti gediya, diya min rojekê ji min pirsî:

—Kurê min tu çima wusa xeberridî?

—Çawa?

—Wusa tewşo mewşo..

—Çawa yanî tewşo mewşo?

—Ma tu nikarî wekî insana xeberdi?

Me bi salan hevdû nedîtibû. Loma nexwestibû pêre pêre dilê min bihêle. Lê êdî hew karibû bipa. Gotinêne min ên "naylon" yek bi yek bi rêt

kir: "grîng", "spas", "ango", "dijwar" û her wekî din..

Canikê tu tiştekî fam nekiri-bû. Ku ez ne şas bim, dilê wê bi min şewti bû: "Gelo dibû ku nexweşînek an tiştek hatibe serê lawê wê?"

Kurmanciya ku em iro li Ewrûpayê dinivisînin, û heta dereceyekî dipeyivin, me ji xelkê dûr dixîne.

Mumkun e ku çend hezar kes bikaribin vê kurmanciyê li Ewrûpayê hîn bibin. Ü mumkun e ku ji van, çend sed kes jî bikaribin kitêb û rajnamen kurmancî bixwînin.

Lê kitêb û rojname ji bo mil-yonan têr nîvisandin, ne ji bo çend sed kesan...

Yani, pişta min ev e; berî ku em di rojname û kitêbên xwe de kurmanciyekê nuh ava biki, gelo ne şert e ku em kurmanciya ku heye binivisînin?

Kurmanciya ku di nav xelkê de dijî.. Kurmanciya ku bi milyonan insanên xwendâ û nexwendî jê fam dikan...

Ev aliye meselê ye. Aliyê din mesela asîmîlasyonê ye. Gerek her du alî bi hev re bêndit.

Meselen ev çend cidî di ni-vîsek weha de bivê nevê sivik dîbin, her kurmanc dikeve yek kirasekî, û her kurmancî li bêjîngêkî dikeve.

Bê guman, istîfsna gelek in. M. Botan yek ji wan e.

(l)Çiroka M. Botan di Armancê de, di hejmara Mîdar 1986 an derket. Perçeyek ji çirok li "Qehwa Biçük" derbas dibe.

CİROKÊN STRANAN

DİMDİM H.HOLİ

çêdike û jê re wilo dibêje:

- Te min ji mirinê xelaskir, li rûyê dinê ci daxwazên te hebin ez amade me pêk bînim. Xano jî dibêje ku:

- Min ne zér û zîv ne jî qesir û avayî divê, ger bi gengaz (mumkûn) be bi qasî çermê gayekî erd dixwazim. Şah vê daxwaza wî qebûl dike.

Xano tîne Gayekî serjê dike û çermê wî zirav di kuniya derziyê re derbas dike û bi qasî dirêjahiya wî çermî erd digre bin destê xwe û kelhekê (dimdim) tê de ava dike.

Dema Şah lê divarqile; dinêre ku Xano hemû deşt û ciya xistiye bin destê xwe û kelhê ji ava kiriye. Li ser vê yekê Şah ordiyek giran hazır dike û dişine ser xano (Dimdimê).

Di navbera leşkerê İranê û şerkerên Xano de bi mehan ser didomîne. Paşê Xano dinêre ku serbi leşkerê İranê re dornaxe, çiqas dere leşker zêde dibe, hemû şervanê xwe dikşîne kelhê. Leşkerên İranê dora kelhê digrin û av û xwarînji ser kelhê qut dikan.

Gelê di kelhê de ji tîna û ji birçîna bêhêz dikeve, êdî nikarin ser jî bikin. Ji ber vê yekê Xano emir dide û hemû hîmî (esasê) kelhê bi barûdê dadigrin. Rojekê bi sibê re kelhe ji binde tevî mirovén di nav de wêran dibe. Di dêli jiyanek bi dili ve de mirina xwe qebûl dikan...

Ev sitrana jêrîn ji sitraneke ji sitrânenu ku li ser serhildana kelha Dimdimê hatine gotin.

Xanê Kurdan tu wa neke
Tu ci kelhan avaneke
Tu hemetaçara serê xwe ke
Xanê Kurdan bêjît:
Tu bide min termeta(bi qandî) çermê gayî
Bo xwe bikim xanî manî avayî
Bo seyrana vî çîyayî
Xanê Kurdan min da te termeta çermê gayî
Nef(nebî) kêmahî nef zêdahî
Bo xwe bike xanî manî avayî
Bo seyrana vî çîyayî

Xanê Kurdan çêkiriye çermê gayî anî dîye
Destê hostan daniye
Kunka derziyê re birfye
Deşt û berî pê girtiye

Xanê Kurdan esasê vê kelhê daniye

Serhosta bêjne Eli ye
Beran birît bi cewa(qelex) spiye
Dimdim anî ber çêkirinê
Hefset palan yê lêkirinê

Hey Dimdim e heware xanê dimdime
Top û tufengan hurme hurme
Xanê Kurdan xweş hakime
Heware xanê Dimdime
Kerwan û bazirganê Şahê Ecem girtin û şelandine
Heware xanê Dimdime

Ev Sitran ji hêla Hekarî ji devê Bavê Şivan hatiye
girtin.

HINDIK * * * * * RINDIK

Yê amade dike : Z. XAMO

KURDİ Û VİDEO

Segman ji hevalê xwe re go:

—Tu zanî, Zarokên me Kurdî ji binde ji bîr kirine. Nikarin du gotina serrast bibêjin, ji Kurdî bêtir Swêdî û Tirkî tevê dîkin. Ev du roj in ji qehra li ser serê xwe digerim.

—Hella hella, tu çawa pê hay bû lo?...

—Welle heta nuha qet bala min nekişandibû, lê ev du roj in ku videoya me xera bûye. İcar bi vê munasebetê ji bêtir fir-send çê bû ku ez hinekî bi zarakan ra biblim. Birao, welleh dîbê meriv giraniyê bide ser zimanê xwe...

—Erê rast e, lê video?...

GELO WEXT Jİ BO ÇÎ YE?

Li balafirxana Anquerê réwiyeke Almanya bi qehr ji hostesê re:

—Xanim xanim, ji xwedê bitirse, ma ka balafira we? Heger ewê balafir di seeta xwe de ranebe, de icar ji bo çi hûn wextê li ser bilîte dînivisînin? Tu ji min re nabê mana wê çiye?

—Ji bo ku bê kêm û zêdayî em bizanibin balafir çend seetan dereng radibin.

TEMAM, TU ATATÜRK İ

Li wê dînyê ezraîl ji Mustafa Kemal dipirse; dibê "Tu kî yi?"

Ew jî dibê : "Ez Ataturk im"

Ezraîl lê vedigerîne, dibê : "Bes bi gotinê em nikarin qebûl bikin ku tu Ataturkî, dibê bi hawakî, bi tiştekî tu xwe îspat bikî."

Ataturk jî dibê : "Çawa, bi ci hawî? Heger hûn şahida dixwazin şahîden min hene; hûn dikarin ji Talat, Enver, Cemal û Abdülhemîd bipirsin, dixwazin binin rarûyî min bikin." Ezraîl qebûl nake; dibê : "Şahidiyavana yekî jî ne mutebere, divê bi tiştekî tu xwe îspat bikî."

Ataturk: Başe, ka bîbêjin bi ci hawî?

Ezraîl: Ên berî te hatin gişa yek bi yek bi hin marîfetên xwe, xwe îspat kirin. Mesela, Beethoven û Mozart bi muzika xwe, xwe îspat kirin, Victor Hugo ji Sefîlan rûpelek xwend, Puşkin helbestek xwend, Raphael tabloyek çê kir, Shakespeare ji Hamlet, Balzak ji romana Gundya, Goethe jî ji Faust hin perce xwendin û Marks jî ji Kapitalê rûpelek xwend. Bi vî hawî gişa xwe îspat kirin. Nuha dora te ye.

Ataturk: Min meraq kir, ma ev navêne we jimartin kî ne? Bi qasî ku tê bîra min di ordiya me de tu sûbâyên (zabit) bi van navana tunebûn...

Wê wextê Ezraîl dibê: "Temam, tu Ataturk i."

DI DİROKA

ME DE

EV MEH

4 Sibat 1956: Iran bi alîkariya Pakta Bexdadê kela ku eşîra Ciwanroya zevt kiribûn bi balafira bombekir.

5 Sibat 1925: Şêx Seîd tevî 100 çekdarên xwe hin serekeşîra ji Darahêne çû Piranê. Li Piranê bi hedîsek tesadûf serîhildana ku dihat hazirikirin zû destpêkir. Ev roj bû destpêka Serîhildana Şêx Seîd.

8 Sibat 1971: Li Hezoyê (Kozluk), DDKO mitînga duduya pêkanî.

10 Sibat 1925: Lîcê ket destê hêzên Şêx Seîd.

10 Sibat 1964: Berzanî û serokê dewleta Iraqê Abdulselam Arîf cara duduya hatin cem hev û agirrawestandinê (te-gerawestandinê) beyan kiri. Li ser vê buyerê di nav Polît Buroya PDK-I de nakokî derket û Celal Talabani û İbrahim Ahmed vejetian.

11 Sibat 1925: Gênc ket destê hêzên şoreşa Şêx Seîd.

14 Sibat 1925: Darahêne ket destê hêzên şoreşa Şêx Seîd.

17 Sibat 1925: Vêrgiya ku gundiyê Kurda talandikir, Aşar hate rakirin.

23 Sibat 1925: İran, Türkiye, Iraq û Pakistan li dijî tevgerên gelê mintiqê û nemaze li dijî gelê Kurd paktek ku bi navê Pakta Bexdadê tê bîrânîn, damezirandin.

24 Sibat 1925: Elezîz ket destê hêzên şoreşa Şêx Seîd.

24 Sibat 1925: Li Gêncê, Mûşê, Erxeniyê, Elazîzê, Dêrsimê, Diyarbekirê, Mêrdinê, Sêwrekê, Ruhayê, Sêrtê, Bedlîsê, Wanê, Hekariyê, Kixiyê û Xinisê Urfa İdare hat ilan kiri.

25 Sibat 1925: Li Meletyê jî Urfa İdare hat ilan kiri.

</div

KURMÊ DARÊ NE JI DARÊ BE DAR NARIZE

Destpêk di rûpelê 1'ê de

wa hi bibîne an derxîne pê navê Kurdan pîs bike.

Lê gelo tişte ku firsetê da CIA û MIT ê (her wiha presa kevneperest a Swêd û Hans Holmér bi xwe jî) ku karibin bi navê Kurdan bilîzin gunehkariyê têxin hustuyê wan û tevgera rizgarîxwaziya Kurd li ber çavê raya giştîya Swêd û ya cîhanê reş bikin, çiye?

Wek me li jor jî got; mudefam dide xuyakirin tu delîlên berbicav di destê polis de tune ne. MIT û CIA û SAPO nikarin delîlek raste rast girêdayî bi mesela kuştina Palme bibînin û pê kesekî Kurd bi tawanbariya qatîle Palme bigrin. Loma jî ne kesekî qatil, ne jî delîlên huquqî yên qetîle li holê ne.

Lê ci, Hans Holmér û presa paşverû ya Swêd be, ci jî dezinformasyona MIT û CIA be hinek kar û bar û beyanên PKK yên berî kuştina Palme ji xwe re dikin argument û demagojiya xwe li ser vê avadikin.

Berî bi kuştina Palme, di navbera sal û nîvekê de endamê PKK ê li Swêd du Kurd kuştin, li welatên Ewrûpa yên din jî êrîş birin ser hin hêz an kesen Kurd, cend kes kuştin jî yan birîndar kîn. Hukumeta Swêd vê rîxistinê wek hêzek terrorîst îlan kir, di derheq hin terefdarên wan de bîryarên mehkemê derxist. Li ser vê yekê li ser devê berpîsiyar an endamên wan beyanên tehdîdwari li dijî Swêd û hukumeta Palme di rojnaman de derketin.

Gava Palme hat kuştin, yên ku dixwestin cinayetê têxin hustuyê Kurdan xwe bi van tiştan girêdan. Gotin ku hebe tunebe hêzec wiha Palme kuştîye. Helbet di rastiyê de ev nedîbûn delîlê wê yekê ku Palme jî ji bal vê hêzê ve hatiye kuştin. MIT û CIA û presa paşverû ya Swêd ji vê rastiyê dizanibûn. Lê wan zanibû ku wê xweş karibin bi van argumentan şika gelê Swêd û ya raya giştî ya cîhanê bikşînîn ser Kurdan, pê tevgera rizgarîxwaziya Kurdî li ber çavê xelkê reş bikin. Ü kirin jî, iro eşkere ye ku MIT jî CIA jî û Hans Holmér jî van argumentan ji xwe re bi kar tînin.

Xwendevan kare bêje ku "gava dilek dijimin bixwaze tevgerê pîs bike, meriv xerabî an cewtiyekî kiribe nekiribe jî ew bi bêbexî tişte xerab dixe hustuyê meriv li ber çavê xelkê reşbike" Erê ev yek jî sedî sed rast e. Gava xerabî û zeifiyê meriv tunebin jî dijimin bi bêbexî gunehkariya dixe hustuyê meriv. Lê ferqek esasî di vir de heye, divê ew li ber çavê me hemûya be. Gava meriv xwedî hin xirabî cewti û zeifiyan be, dijmen hêsanît kare raya giştî bi derewên xwe bike bawerkirin, lê meriv dûrî van tişten han be dijimin zû bi zû nikare derewên xwe bi raya giştî bide bawerkirin, meriv kare zûtir û hêsatir derew û dezinformasyonen dijimin pûc bike.

Di mesela kuştina Palme de jî ev yek xuya dice. Gave Palme hat kuştin MIT û CIA û kevneperesten Swêdî fikirin ku karin bi reheti bêbexiyî li kî bikin wê ji xwe re hilbijartîn. Ü di armanca xwe de bi gelek alîyan biserketin. Lê heger ev zeiffi di nav Kurdan da tunebûya, zû bi zû rê nedidîtin ku vê bêbexiyî bikin û bîghen armancê xwe.

Gava kuştin li welatên Ewrûpa çedîbûn hin hêz û kesen Kurd, bala me hemû Kurdan dikşandin ser xerabiya vî karî û digotin ku ev xizmetê nade tevgera rizgarîxwaziya Kurdî, bilesk dijmin kare fêdê jê bîbîne. Ji bo armancê xwe yên qirêj bikarbîne. Ev rastiya han iro derketiye pêsiya me hemû Kurdan. Dijmin şâşitîyê me ji xwe re bi kar tîne û dike argumenten demagojiya xwe, tevgera me ya adil a bi rûmet li ber çavê cîhanê reş dike, hewl dide me li cîhanê bê dost û dilxwaz bîhêle.

Peyvek bav û kalên me heye ku gelekî di ciyê xwe de hatiye gotin: "Kurmê darê ne ji darê be dar narize" Heger em di nav xwe de ne zeif bin, karû barê me bi xwe çewti û xerabiyan di nav xwe de nehewîne, tavana dijimin jî bi ser me de were wê nikaribe tevgera me birizine. Na em kurmê nava xwe ji hundurê xwe navêjin; xwe ji şâşî û xerabiya bi dûr nexin, dijmin li çavên me yên şîl nanihêre û ci ji dest bê wê bike.

Almanya Federal

Buchen

Mafê Helbijartînê Herêmî ji bo hemû biyaniyan

Li Almanya Federal, berî helbijartînê giştî rîxistinê kirêkaran ên Kurd û Tirk, xebata xwe ya ji bo daxwaza "mafê helbijartînê herêmî ji bo hemû biyaniyan" gurr kîn. Bi vê daxwazî namek ji raya giştî ya Alman û ji şexsîyetê bi nav û deng re "Namek Vekir" hat nivîsandîn. Di bin vê namê de îmza Av. Dev. Genç, Birlik Yolu, DIBAF, FİDEF, GERÇEK-ADK, İŞÇİ GERÇEĞİ, KKDK, KOMKAR, KURD-KOM, KURTULUŞ û YSK hebû.

Her wiha van rîxistinê navê wan li jor dayî, gitina DİSK' ê jî bi belavokek müşterek protesto kîn. Di belavokê de cih dan êrşîn Cunta Tirk û kar û barênen wê yên qirêj ên van demen dawî.

R.O.
Almanya Federal

Swêd

Di qebûlkirina Multeciya de wê hin guhertin bibin.

□ Wezirê Biyaniya yê Swêd:

"Divê di derheq multeciya de bîryar di nav du mehan de bê standin"

□ Komîsyona Dewletê ya Multeciya:

"Divê polis bi serê xwe bîryara ku multeciya ji hudûd vegerîne, nestîne"

Wezirê Biyaniya yê Swêd George Anderson di derheq probleman qebûlkirina multeciya de beyanek da. Wezir di beyana xwe de got: "Bîryardayina li ser multeciye kî nuh hatî carna du salan zêdetir dikşîne. Divê ev wext ne hewqas dirêj be. Em dixebeitin ku vê wextê daxîn du meha" Wezir di axiftina xwe de li ser problemen multeciya ku di navbera van du salan de dertên, sekinî.

Çendekî berî beyana wezîr, li ser pirsên multeciya hin pêşniyâr ji alî Komîsyona Dewletê ya Multeciya çû ji hukumetê re. Di nav van pêşniyâra de du nuqtênu muhîm hene;

"Divê polis bi serê xwe bîryara ku multeciya ji hudûd vegerîne, nestîne"

"Divê heqê abûqat girtinê bidin multeciye kî surgûnê wela-tê xwe an welatekî ku li wê derê iştimala tade û işkencê pê bikin"

Ger hukûmet van pêşniyâra qebûl bike, wê wextê wê wek qanûnek nuh, di destpêka Tirmehê de têkeve jiyanê.

Li Wêranşarê gundî li dijî bertîl û zulmê derketin

□ Li ser giliyê 15 gundiyan çawîse qereqola gundê Tûnçbilek û hevalbendekî wî hatin girtin.



Ji derba faşîst a 12'ê ilonê û vir de li gundén Wêranşarê ji wek hemû gundên Kurdistanê zulm û zor û bertîlxwarina (ruşvet xwarin) çawîş û leşkerên qereqolên gundan geleki pê de çû. Wer bûku, çawîş û leşkerên qereqolên gundan ji bona ku ji gundîyan bertîlê bixwin, li ciyê rehetyê gundî kişandin qereqolan, bi rojan neheqî û işkence li wan kîn. Ji bona xelasbûna ji ber vê hovîtiya dewletê, gundî ji mecbûr diaman ku ji quêt xwe û zarokên xwe bikin û têkin gewriya sübâ-y(zabit) û leşkerên qereqolê. Vê hovîtiyê bi salan dom kir.

Lê di dawîya meha Çileyê Pêşîn (12/86) de edî kîrê da hestîyê gundiyan û 15 kesan bi hev re li çawîş qereqolê Erkan Keleş gîlî kîn û iştîdak(arzualek) dan mudîfûmûm (sawcî) Wêranşarê. Di iştîda xwe de dibêjin ku, çawîş qereqolê hetanî iro pirrani-

ya gundiyan bi kîmasi sê rojan avetiye nizaretê û di bin çuyan re derbas kîn. Ü bi vî hawî, bi darê zorê gundî mecbûr kîn û bertîlê bidin wî. Ê nedaye, ya jî gotiye tune ye bi rojan di nezaret qereqolê de hatiye girtin û heqaretîn mezin lê bûye.

Cardin gundiyan di iştîda xwe de dibêjin ku ji gundî Eyyûb Yildiz ji bi çawîş re hevkârî kîn û wî jî ji bona berdانا kesen girtî ji gundiyan pere xwariye.

Li ser vî giliyê gundiyan Mudîfûmûm Wêranşarê çawîş û Eyyûb Yildiz her du jî tewqîf kir. Kesen ku gili kiribûn evin:

Husên Goren, Seydo Hançer, Eyyûb Çay, Mehmet Adnîn, Rezeman Adnîn, Sinan Demîr, A. kadir Goren, Eyyûb Demîr, Seydo Demîr, Mahmût Hançer, Sinan idîkurt, Kadir Çay, Şehmûs Aşan, Mehmet idîkurt.

BI KURTÎ

□ Li gor iştîstekîn rojnama Îngîlîz; The Guardian, di nav gelên ku daxwaza îlticatiya siyasi li welatên Ewrûpî kîn, Tirk di dereca Sisiya de tîn. Tirk bi piranî li Almanya Federal (7.500 kes) dû re bi dore, Îswîçre (4 hezar) Fransa (2 hezar), Danîmarka (1000) û ji Swêd (500) daxwaza îlticatiya siyasi kîn.

Bi 29 hezar kesî Sri Lanka serî dikşîne, Îranî bi 23 hezar kesî di rîza duduuya de ye û Tirk jî bi 14 hezar û 900 kesî di rîza sîsiya de ne.

□ Isal 80 hezar turîst çûn Kextê. Kexte bajarekî piçûk e li Kurdistana Tirkîye bi ser Adiyamanê ve ye. Li vê qezê li hindî çiyayê Nemrûd gelek eserên tarixî û hîja hene. Mezelê (gora) Hukumdar Nemrûd û Pira Cenderê gelek bala biyaniya dikşîne. Piraniya turîstan; Alman, Fransiz, Îngîlîz û Swêdî ne.

□ Li Sundsvallê (bajarekî li bakurê Swêd dikeve) roja 17.1.1986' a de şevez Kurdî hat pêkânîn. Di şevez de folklor Kurdî û muzîka Kurdî hat pêkêşkirin. Gelek Swêdî di şevez de hazirbûn.

□ Roja 17.1.1986' a de Şeva Kurdistan Spor çêbû. Şev ji bo munasebeta pirozkirina şampiyoniya Kurdistan Spor hate amadekirin. Kurdistan Spor di grupa 8'an de bû şampiyon û derbasî grûba 7'an bû. Di şevez de madalya li leystikvan û antronîrê taximê hat belav kîn. Di şevez de folklor û müzik jî hebû.

□ Ji bo munasebeta salvevara damezrandina Cumhuriyeta Demokratik ya Mahabad li Stockholm şevez çêbû. Di şevez de axaftinek li ser mana rojê hat kîn. Mûzîk, folklor jî di programa şevez de hebûn. Şev ji aliye terefdarên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê hat amadekirin.

Weşanen Nuh

HEMEDOK (Înce Memed)

Kitêba Yaşar Kemal a bi nav û deng "Înce Memed", çapa wê ya bi Kurdi (Soranî) jî derket. Kitêb ji alî Ebdullah Hesenzade ji çapa Farisî hatî wergerandin. Wergêr navê kitêbê (Înce Memed) kîriye HEMEDOK.

Kitêb 552 rûpel e û di payiza 1986' an de ji teref "Wezaretî Roşînbîrî û Rageyandin- Dezgây Roşînbîrî û Bilawkirdinewey Kurdi" li Bexdadê hatiya çapkirin.

JİN

Cilda III'ya ya kovara Jîn derket. Di vê cildê de hejmarên 11-15' an ci digrin. Ev hejmar him wek orjinalê xwe û him jî bi ziman û alfâbî iroyin wergerên wan ci distînîn. Wek tê zanîn kovar ji aliye M. Emin Bozarslan ve têne wergerandin.

LES MONTAGNARDS CHRÉTIENS DU HAKKARI ET DU KURDISTAN SEPTENTRIONAL

(Fellehîn Çiyây yê Hekkarî û Kurdistana Bakur) Niviskar: Michel Chevalier, Paris, 1985, 418 r.

Kitêb nû di nav Weşanen Beşê Coğrafya ya Universita Sorbonê li Paris derket. Kitêb bi Fransî ye. Tê de ji destpêkê ta 1980 yî qala filehîn Kurdistanê, bi taybetî jî fillehîn Nastûrî dike. Her weha têkiliyên wan û Kurdan û serê wan û Kurdan jî tê de cih digre. Wek tê zanîn Nastûrî ne milletek e lê mezhebek e di nav İseviyan de, ku ev mezheb ji alî keşîşî hatiye damezrandin. Navî vî keşîşî bi xwe Nestorias bûye, û di sedala 5'an de jîyave. Niviskar her wiha diyar kîn ku ev Nastorîyên Kurdistanê piranî wan bi Kurdi jî dîzânin, û cil û bergê wan jî wek yê Kurda ye. Di kitêbê de 7 Xerîte jî hatine çekirin ku hemû ciyê filehîn Kurdistanê nîşan didin. Hînek xerîte yê bâjara na wek Hekkarî, hînek jî yê heremekê ne wek Botan, Cebel Tûr û hwd. Niviskar di gelek ciyan de qala Kurdîn Ezidî jî dike.

Di dawîya kitêbê de navê 453 çavkariyan hatiye niviskin ku niviskar ji wan sîd (fêde) girtiye.

Ev kitêb ji bo kesen ku lêkolîn li ser jiyanâ Kurdan a sedala 18, 19 û 20' an dike dê gelek bi kîr bê.

Burjuvaziyê Tirk Faîk Bûcak kuş

Bûyera Faîk Bûcak, bûyerek dîrokî ye. Ew ji alî kî de hate kuştin dibê bê zanîn. Dibê meriv viya derxe, eşkere bike.

Faîk Bûcak û ên wek wî hîja, ji bona pêşdeçûn û şaxberdâna têkoşîna gelê Kurd xebat kîn û xwîna xwe rijandin. Em gelek tîş deyndarî wan in. Dibê em li van şehîdîn xwe xwedî derkevin, wan di bîranîn û di niviskin xwe de bidin ji yandin. Lê hezar heyf hetanî nuha bêyî hin xebatên ferdi tu tiş nehatiye kîn. Dibê em vê çembera teng û zengarî bîşkînîn û kî li ku derê ci ked ser kîn û bûne qurbanî ci, lêgerîn û niviskandina van bûyera wezîfa her ronakbîr û we latparêzî ye.

Piştî kuli Kurdistanê ez teví Tevgera Demokrat a Şoreşgerî bûm min li ser Faîk Bûcak gelek lêkolîn çekir. Lê heta nuha ev yek li tu derê niviskand.

Bavê Faîk Bûcak Hesenê Abika (Hasan Oral) mala xwe ji gundê Hedro barkir cû li gundê Gebendris (Ev gund 6 km. ji Swêregê dûr e) bi cî bû. Piştî demek kin ji wir jî barkir, hat başer (Swêregê) bi cî bû. Hesenê Abika axê gund bû. Lê gund bi tevayî ne yê Hesenê Abika bû, nîvî jî yê mala Şêxa bû.

Çaxa Faîk Bûcak hat kuştin ez 6 salî bûm. Wek xewnek şe va tê bîra min; digotin, "Lawê Hesenê Abika Faîk kuş" Erê dijiminê mala Faîk Bûcak hebûn. Lê belê hedîsî wer li hev râgirtibûn ku, iştîxbarata mîtingehîkarên dewleta Tirk û dijiminê wî bi hev re ev qetliama birin serî. Berî kuştina Faîk Bûcak bi heftakê, di navbera wî û qumandarê Alaya Ruhayê de munaqaşak mezin çêbûbû. Lê pirr heyf ku naveroka wê munaqaşê kes pê nizane. Lê belê piştî eşkerebûna hin delîlan, diyar bû ku mesele siyasi ye. Dijiminê mala Faîk, İhsan Kazo (İhsan Kazolu) ye. Ku ev ş

**Destpêk di rûpelê I'ê de
Şefê Polisê
Stockholmê**

Bi beyanê Polis re, hê ji tariya sibê de rojname û telewîzyona Swêdî û ajansên cihanê rabûn piyan. Hewak wer hat çekirin, fena ku qatilên Palme hatine girtin. Speklasyonê presê, heyecana Swêdiya bilind kir.

Polisê Stockholmê bi van beyanê xwe re dabû xuyakirin, ku wê pişti nîvro, mudiûmûmê qetla Palme û Polis bi hev re konferanseki piresê çekin. Dinya bi wê heyecana bilind ma li hêviya konferansa pişti nîvro.

Lê gava pişti nîvro konferansê destpêkir û Clas Zaime dest bi axaftinê kir, rojnamevan hemû mat man, wek ava sar bi serê wan de bê dakirin. Çimkî mudiûmûm digot ku "Tu delîl li ser kesen bi çav nînin ku meriv bi şika beşâriya kuştina Palme wan bigre mehkeme bike. Loma jî kesen ku bi vê şikê ji bal Polis ve hatine girtin heta êvarê wê bê berdan."

Evarê ev kesana hatin berdan.

Li gor polisê Stockholmê, ji %95 şika wn li ser wê yekê ye ku destê PKK û di kuştina Palme de heye, kesen girti ji endam û dilxwazên vê partiyê ne û ev kuştin ji bal wan ve hatiye kirin. Lê bi biryara mudiûmûm a berdana van keşa û bi beyana wî ya ku digot "Tu delîl tune ne ku ev kes bi vê şikê bêñ girtin." Bi vî hawî şika Hans Holmér a %95 a li erdê ket, pûç bû.

Esas ev cara pêşî bû ku şefê polis Hans Holmér di mesela kuştina Palme de navê PKK hewqas eşkere dida. Lê speklasyona li ser navê PKK ne nuh bû. Hê heftek di ser kuştina O. Palme re neçûbû ku hin rojnamen Swêdî bêyi eşkerekirina çavkaniyên xwe (le her kesi dizanibû ku çavkaniya wan polisê Swêd bû) dan xuyakirin ku polis ji PKK şikê dike. Ji wê rojê bi ver de ye, her heftek du hefte di nabverê ve diçû nedîkü ku rojnamen Swêdî (û di riya wan re yên welatên Ewrûpa Rojava) navê Kurdên di vî karê qirê digerandin. Bi taybeti rojnamen kevneperek baskê rastê (wek Expressen) bi teşwiq û paldana MIT a Tirk û CIA yê di bin navê PKK de xwîna Palme dikirin stuyê gelê Kurd û Kurd ji wek qatilan nîşan didan. Vê yekê ji him li Swêd, him jî li welatên Ewrûpa yên din tesfîrek gelekerab li ser tevgera rizgarîwaziya Kurd û multecî, karker û xwendevanê Kurd dikir.

Lê ji alî din jî ev cara pêşî ye ku resmî, bi devê berpirsiyaran navê PKK û pê re ji navê Kurdan bi kuştina Serokwezîrê navdar Olof Palme re tê gotin. Ya muhîmtir jî, şefê polis Hans Holmér eşkere dibêje ku hîn dev ji şika xwe bernedaye, li gor wî ev şop hîn şopa esasî ye.

Îro heyata mudiûmûman û ya polisê lêgerîna qetla Palme, li ser vê şopê bi hev ketine. Polis di ya xwe de ısrar dike û mudiûmûm ji dibêjin tişti ji vê şopê dernayê, vala û pûç e; divê polis dev jê berde û cardin vegerin destpêkê, vegerin şeva kuştina Serokwezîr û ji wir destpê bibe.

Loma jî, wek rojnamen Ewrûpî ji dibêjin Hans Holmér di kar û barêñ xwe yê heta îroyîn de ku dabû ser şopa PKK, di vê şopê de şemîti. Lê spekulasyonê li dor navê PKK hîn xelas nebûne. Û ya xerabtir, ku qatil neyê dîdîn wî demê ji ev speklasyonana

her dom bikin. Wî çaxê ne huquqî be jî, di riya speklasyonan re wek qenetek siyasi wê kuştin di stuyê Kurdan de bimîne; Kurd wê têkevin bin şika miletê Swêd û yên cihanê. Wê gavê miletê Kurd bi dehsalan ji wê nikaribe vê leka res, ji ser xwe rake. Hêviya Kurdan ew e ku rojekê zûtir qatil bê derxistin û dawî li wan speklasyonê li dijî tevgera rizgarîwaziya Kurdi û gelê Kurd bê.

Tirkiyê bi dizî

Nûri Eren dizane ku îşxalek wisa wê Tirkiyê têxe rewsek dijwar û li dînyayê jî wê liember Tirkiyê cephek mezin vebe, loma jî ew, di warê "diplomatîk" (!) de vê pêşniyarê tîne.

"Mudaxele dibî erdê ilhaq neke, herêma hat îşxalkirin dibê huwîyeta wê vekirî bimîne. Li gor bûyeren navnetewi dibê Tirkiye, di mulkiyeta Iraqê de (condomînum) ka-ribi teklîfekê bike" Bê Nûri Eren, hin nîvîskarê Kema-listen din jî ev tesviya îşxalê parastin. Di nav van de, kole dijmin û xayinê herdu dinya Kamûran Înan jî heye.

Cardin li gor hin çavkaniyên diplomatîk hin hazırlîyên din ji delaleti haziriya îşxala Mûsil û Kerkükê dikin.

Hetanî heftakê wê keştiyek (gemiyek) herbê ya bi Filoya şesan ve girêdayî bê Antalya-yê. Li ser şargeha (üs) Încirlikê hazîri heye. Tatbîqata Zivastanê ya li Agiriyê, ku ewe ev tatbîqat li Erzeromê çêbi-ba û heta nuha jî ev tatbîqat her li Erzeromê çêbûye. Û li Qibrîsê li şargeha Dikelya kombûna hêzên Amerîka.

Bê guman işaretên haziriya Tirkiyê ya îşxala Kerkük û Mûsilê ne ev nuxtên jorîn tene ne. Hin tiştên din jî hene ku vê niyeta diktatoriya faşist eşkere dikin. Beri her tişti ev çend carin ku Cunta teşebusî vê yekê dike lê nabe serî. Ya din jî, di van rojêñ dawî de zi-yareta alîkarê Serokwezîrê Iranê Muayyerî, di serî Sibatê de çûyina Turgut Ozal û hin girre-girrêñ dewletê ya Amerîkayê cardin bê van "ziyaretan" hat diyarkirin ku di meha Sibatê de wê Serokwezîrê Iranê Musevî bi xwe ji bê Tirkiyê û ji van jî muhîmtir, li gor xebera ku me dawiyê ji welêt girt, ordiya Tirkiyê seferberlikek qismî ilan kiriye û ban hin ihtiyata kirene.

QEРЕJДАХ

weşxane heye û ne ji dîspan-serek. Dema yek nexweş bi-keve, heger ku heywan (ker, hesp) bişuxulin bi heywêñ di-

bin bajêr, na wexta ku heywan ne şuxulin wê çaxê jî jê re darbestekê çêdikin, çend kes dikevin binî û bi wî halî dibin bajêr, ser doktor içar bê guman gelek cara ji nexwes nagihê ser doktor, bi rîve dimre.

Çendekî berê, ji Hesarê, Qûncaesmê, xweşîte û ji Olgeçin hin gundiyan di rojnama Cumhuriyet de li ser vê rewse derd û kulén xwe anîn zîmîn. Ji Qûncaesmê Sinan İlhan wisa dibêje:

"Di mehîn zîvîstanê de tê-kîlyen me bi navçê re (Wê-ranşar) bi carê de têbîn birin. Rê tune ye, erebe tune ye, heger me karibiya ker, ya ji hesp bidita ji xwe me dî, na dema me nedî dibê em nexwesêñ xwe li pişta xwe kin, 15 kilometran di gerrek û heriyê de bimeşin hetanî ku xwe bîghtin ser riya mezin. Li wir eme

li benda erebekê bimînin, lê ji ber ku rê ne xweş e erebe jî derbas nabin. Ez dikarim bî-bêjim hema hema her sal ji her gundekî merivek du meriv dimre..." Rojnamevan dipirse; dibê, "Lê dema pîrekên we dikevin ber zaruyê hûn çerdikin?" Bersiva Sînan İlhan wisa ye: "Pîrekên me ya bi emrê Xwedê zaruya (geda) tînin û ya jî dimrin. Hetanî iro bes ji Qûncaesmê 30-40 pîrek di ber zaruyê de mirin. Üji sala 1981'ê û virde jî bes ji Qarînçê 24 pîrek di riya Wê-ranşarê de mirin..."

Bê şik çêkirina riya Qerejdaxê nexweşxanekî li Qarînçê ya jî vekirina dîspanserekê ji kolonyalîstên Tirk re pirne dijwar e. Lê eşkere ye ku ew tu qîmetê nadîn jiyana in-sanên Kurd. Loma jî çêna-kin. Li hin ciya riya çedikin ji bo ku bi hêsayî leskerên xwe bibin û bînîn û êrisi gelê Kurd bikin û li hin ciyan jî rê û nexweşxana çênakin ji bo ku Kurd di riyan de bimrin.

Lê tiştek gelek dijar e, heta ku Kurdistan bindest be, bi vî hawî, ya jî bi wî halê me her wê ev be.

LI HEWLÊRÊ

yawê û Hêlawâ de bi hêzên dij-min re ketin ser û ew şikandin.

Dijmin di van her çar erîsan de qewetek mezin topkîribû û li gel vê qeweta mezin gelek silehîn gîran û tank jî xebitandin. Ji aliye din de ji, balafîren Şer, Pilatoz û du helikopter û sê balafîren din jî bê nabêñ erdê ser bombardûman dikirin.

Pêşmergên Yekiti Niştimanî Kurdistan û yên Partiya Sosyalist bi hev re êrifek birin ser hêzên dijmin yên aliye 1,2 û 3'an. Di gundê Şêx Şerwan de hêzên dij-min imha kirin. Ku ev gundikev nav aliye sisîya. Her wisa li aliye 1 û 2'an jî zirarîn mezin gi-handin dijmin.

Netica Şer:

70 kes ji caş û serbazan hatin kuştin. Cendekê 29 kesan di qada ser de hat hiştin.

Ü bêî kuştian; sê kamyonên leşkeri ji marqa Ivo û 6 kamyonên din ku caş neqildikirin hat şewitandin.

Ü ji silehan jî; 2 RBG, 7 hebênen wan 20 gulle li ser bû, 21 Kelenşînkof û 8 jarjor, jîpek û Toyotak Berazîli, 2 sandoq fîşek, 30 betâniye û 20 qapûte leşkeri ketin destê pêşmergan.

Di vî serî de çar pêşmerge birîndar bûn û pêşmergeyek ji ji Hizba (patiya) Sosyalist şehîd bû. Navê wî AHMED MEWLÜD e.

İdrîs Barzanî

jê razî têkoşerê Kurd yê bi nav û deng heval İdrîs Barzanî, kurê Barzaniyê nemir, endamê Polit Biroya PDK-Iraq bi emrê xwe yê 43 salî çûye rehmete.

Êşekê ji nişkê ve û hişk dilê heval İdrîs Barzanî di roja 31.01.1987 an de, saet şeşê evarê rawestand.

Ji ber vê yekê em serxweşîye ji Malbata Barzaniyê hêja û her wiha xudê jê razî, bi şe-wekî giştî ji serokê Partiyê hevalê têkoşer Mesûd Barzanî û hemû endam û pêşmergên Partî û seranser bi şe-wekî taybeti li gelê Kurdistan dikin.

Mîrina İdrîs Barzanî, li nav malbata wî, PDK-I û hemû gelê Kurd û dosten tevgera rizgarîwaziya Kurdi bû sedemê xemgînek mezin. Li hundurê welat û derveyî welat ji bo bîranîn û taziya İdrîs Barzanî civîn û merasim çebûn. Taziya wî ya li Swêd, li Stockholm roja 5' û Sibatê vebû û sê rojan dom kir.

HEVKARIYA...

Destpêk di rûpelê 4'an de

menîstanê û Kurdistananê, dest bi serhildana xwe bike. Bi vî awayî, her car wextê ku lê bihata Ermêni li hemberî hukumeta Turkiyê rabûna, Kurd dihatin alîkariya wan, úsa jî Ermêniya alîkari didan Kurdistan.


Destpêka qirnê 19 a, hukumeta Turkiyê ya eskerîfeodal, bere bere pûc dibû. Bi saya pêşdeçûna kapitalizmê dest bi berewpêşdeçûna avabûna netewa (mîletan) dibû, wî çaxî mîletî-azadariyê hênuh bere bere serê xwe hildikir, her úsa jî dest bi serhildanê Kurdistan dibûn. Lê hukumeta Osmanî bi her awayî, hewl didan li dorwan serhildana bigre, nehêle ku ew fi-rehtir bibin. Bi vê niyetê, wê ûzin da wan serekvanê Kurdistan yên xwebixwetiya xwe windakiribûn, ku erdên Ermêniyan zeftkin û li wir hukumdariya xwe bidin sekînandin. Ji bilî wê yekê, gelek caran hukumeta Osmanî, bi darê zorê Kurd li ser Ermêniyan bi cih dikirin, ku ji bo şerî netewayeti û nabêna Kurdistan û Ermêniya pêşdi bibe.

Sala 1839-40 û İsmâil Paşa, 5-6 hezar Kurd mecbûr kirin, ku herin li gundê Ermêniyan ên rex çemê Dicîlê cîwar bibin û hema wê salê di 30 gundê Ermêniya de ew bîcîh kirin. Hukumeta Turkiyê, bi vê yekê dixwast Ermêni û Kurda derxe hemberî hev, lê ev yek jê re lihev nehat. Kurden ku di wan gundan de cîwar bûbûn bi rîndi ji bal Ermêniyan ve hatin qebûl kirin, bûn dasten hevûdu.

**WÊRANŞAR
Li Qadikoyê terora dewletê**

Di orta meha Çileyê Pêşîn de hêzên leşkeri avetiñ ser bera Mexsoya (gundê Qadi-koy) û operasyonek mezin çêkirin. Bê guman sebeb cardin wek hertim muxbirî nîşan dan. Bi seetan mal bi mal ge-riyan, zexîre û tif-tarê gundiyan sero-binî hev kirin. Bi vê jî nehatin serî, gotin û xebere-n nemayî ji gundiyan re dan.

Di vê operasyonê de li ser xorkeş 16 salî, Aydin Ergoz şeşderbek girtin.



Ez dixwazim di vê nîvîsa xwe de bi kurtî li ser mesela aşîtiyê, aşîtiya dinê biseki-nim. Ji bona karker û gundi-yê kedkarê Kurdistanê, ma-na aşîtiyê çiye û gava tê gotin aşîti an aşîtiya dinê ji wan re çi ifade dike?

Meriv gava li rojname û kovarîn pêşverû dinê re, gava li ser mesela aşîtiyê û şoreşa wî welatî ve ye li her welateki jî girêdayî bi şoreşa wî welatî ve ye. Loma her gava mesela aşîtiyê bête hollê, gerek ev bin çav nebe. Karker, gundi, kedkarê Kurdistanê; bi tevâyî gelê Kurdistanê di binê zilm û hovîtiyek nedîti de ye. Ji tevâyîya mafê xwe yê însanî bêpare, tevlî Kurdistan ku hewqas dewlemende jî, bêkarî, nezanî, cahiltî, nexweşî, her berdewam e. Hefs û zîndan û işkence her berde-wam e. Welatê wî perçekirî û mîtingehe. Tişte herî gi-ring iro Kurdistan, seranser bi tesîs meqerên (bingehîn) Amerîka û NATO'yê û nukleerî dagirtî ne.

Ji ber vê yekê jî têkoşîna karker, gundi û kedkarê Kurdistanê; bi tevâyî gelê Kurdistanê ji bo aşîtiyê, têkoşîna ji bo serxwebûn û azadiyê pê ve tu tiştek nîne.

Lazim e partî, hêz û şoreşer-gerên Kurd û Kurdistanê vê yekê li her ciyî, her platforme bidin ber çav, ji hev neqetin. Têkoşîna gelê Kurd jibo serxwebûn û azadiyê, têkoşîna jibo aşîtiyâ dinê ye ji. Wek Ho Ci Minh dibêje "ji serxwebûn û azadiyê bi rumettir tiştek nîne."

JI SERXWEBÛN Û AZADÎ BI RÛMETTIR TIŞTEK NÎNE

Z. SEYDA

yî an sê yeka wî jî li welatên bindest bête xerckirin: Wê bêkarî rabe, newxeşî rabe, bêxwendin û bêniyîsandinî rabe. Dinya ser û ber wê xweş bive: Tişki xweş û gel-ek baş. Lê gelo heta hukma sistêma emperyalist-kapitalist li ser ruyê erdê dom bike ev mumkun e? Ji ber vê yekê aşîtiyâ dinê gi-redayî bi şoreş ve ye li her welateki jî girêdayî bi şoreşa wî welatî ve ye. Loma her gava mesela aşîtiyê bête hollê, gerek ev bin çav nebe.

Karker, gundi, kedkarê Kurdistanê; bi tevâyî gelê Kurdistanê di binê zilm û hovîtiyek nedîti de ye. Ji tevâyîya mafê xwe yê însanî bêpare, tevlî Kurdistan ku hewqas dewlemende jî, bêkarî, nezanî, cahiltî, nexweşî, her berdewam e. Hefs û zîndan û işkence her berde-wam e. Welatê wî perçekirî û mîtingehe. Tişte herî gi-ring iro Kurdistan, seranser bi tesîs meqerên (bingehîn) Amerîka û NATO'yê û nukleerî dagirtî ne.

Ji ber vê yekê jî têkoşîna karker, gundi û kedkarê Kurdistanê; bi tevâyî gelê Kurdistanê ji bo aşîtiyê, têkoşîna ji bo serxwebûn û azadiyê pê ve tu tiştek nîne.

JI BO ZAROKÊ BERSİR JÎ TIRKÎ HÎNB

Ressamekî Kurd

GAZİZADEH

Gazizadeh ressamekî Kurd e, ji Kurdistana û Iranê ye. Nuka li Parîsê dijî. Ew di sala 1946 an de li Kurdistana û Iranê li bajarê Saqezê ji diya xwe bûye. Wî, dibistanê seretayî, navendî û liseyê li Mehadê temam kiriye.

Piştî lisê, li Tehranê di Universiteya Hunerî de, di beşê resim de dest bi xwendinê kiriye. Wî di 1971 an de univîsite xelaskirîye. Pişt re çûye

eskeryî, di dûre li liseyê wek mamosteyê Hunerê dest bi kar kiriye.

Di 1979 an de, li Universîta Tehranê di Merkeza Hunerî de dest bi mamosteyî de.

Gazizadeh di dawîya 1983 an de hatiye Parîsê. Di 1985 an de metrîsa xwe li Universîta Vincennes (Parîs) ê temam kiriye û nuha jî di haziyya DEA (destpêka doktora-

yê) de ye, ku ev têza wî jî li ser huner û bi taybetî resim e. Gazizadeh wek rî, realizmê girtiye. Ji ber ku li gor wî “di risman de bi realizmê mirov dikare bir û baweriya xwe pirs û pirsgirêkên milletê xwe baştar bide diyar kirin.” Li gor Gazizadeh “wezîfa hunermend (ressam-mûzîsiyen) ew eku bikaribe bi hunera xwe tiştekî, sinyalekê bide insaniyetê. Rastiya ci-wakê, ya jîyanê nîşan bide.”

Dîsa li gor wî: “Divê mirov ne ku li ser na-vê milletê Kurd nav û dengê xwe bilind bike, bilekis dîvê ku mirov li ser karê xwe yê huneriyê wêlê bixebite ku di pê re bikaribe bi wê huner û sen’eta xwe nav û dengê milletê xwe jî li cîhanê bi de na-sîn.”

Gazizadeh di gelek



M. Lewendî

pîşanga-han (exposition/utställning/sergi) de tabloyen xwe nîşan daye. Berî 1979 an yanê di dewra Şah de li û Iranê wî nikaribûye tu pîşanga-hek vekira. Piştî inqila-

ba Xumeynî demekê fersend diye ku veke. Li gor rîzê pîşangahê wî di van salan de hatine amade kirin. 1980—Li Galerî Nexş (Tehran) 1981—Li Muza Eseren Hevdem (Tehran) 1982—Li Muza Niyaveran (Tehran) 1983—Li Muza Eseren

Hevdem (Tehran) 1984—Li Banliyoke Parîs (Parîs) 1984—Li Enstituya Kurd (Parîs) 1984—Li Dortmund-Bonn (Almanya) 1985—Li FîAP ê li gel hin resamên din. (Parîs) 1986—Li Aubervillier, li gel resamên Şiliyê (Parîs)

17.12.1986-Parîs



Pêşmerge / 1984



Keçî Kurd / 1986



Mindal Le İngilab / 1980

Ilîm û Teknîk

Lêkolîn û Dewra Kevnare :

Kalikên Me Ji Nû Ve Tê

Mirovan 100 sal berê, ji hestiyê serî dest pê kirin û xwestin, ku laşê derveyî mirovan biafi-rin lê belê ev xebat bi gelempêrî bû û ji bo vê yekê tu portre ne hatibû tesbit kirin. Profesor Michail Gerasimov (1907-1970) ji Sovyetê cara pêşîn li gor xetê hestiyê serî dest bi afirandina portrê kir. Xebata wî ya ewili portreya mirovekî Jawayî û ya mirovekî Neander-tali bû. Herdû portre ji di sala 1927 an de li Muzeya Îrkutskê hatin bicikirinê. Di wê demê de Profesor Gerasimov, li unîversîta Îrkutskê dixwend.

Michail Gerasimov, ji sergiya li bajarê Îrkutskê di sala 1927 a heya mirina xwe ji bo pêşde birina metodê xwe xebat kir. Wî, di sala 1950 de bingeha labaratûwara rekonstruksiyona antropologiya plastikî ya ku girêdayî Înstîtuya Entografa ya Akademiya Ilmî ya Sovyetê bû, avêt. Niha serokiya vê laboratûwarê şagirta Profesor Gerasimov, Galina Lebedinskaya dike.

Metodê ku hatine bikaranînê, ji bo lêgerîna kesen sudar hate bikaranîn û netîca vê metodê de hatiye tesbit kirinê, ku portreya ku hatiye çekirin û kesê ku suc kirîye dişibin hevdu. Ji vê yekê jî ji bo tesbit kirina kesekî ev rekonstruksiyo-na hatiye bikaranînê. Pişt re hat dîtin, ku mirov dika-

re vê metodê, ji bo afirandina portreyen kesen dîrok-kê ku diruvê wan ne hatine parastinê, bi kar bîne. Ku em mînekî bidin, niha em dizanin dirûvê İvanê Zalîm, Timurlenkê talanker û Rudakiyê ku bingeha helbesta Faris-Tacikî avêtiye, çawa bû.

İvanê Zalîm

Di buhara 1963 an de, gorra İvanê Zalîm (1530-1584) ku li Katedrala Mikailê Sermelek li Kremlînê ye, hate vekirin. Ji işkeletê wî yê ku bi riye-ke baş hatibû veşartinê, xûya bû, ku bejna İvan dîrê bû (ne kêmî 179 cm). Dîsa ji işkeletê wî hat fam-kirin, ku ew di ciwaniya xwe de bi qewet û qewî bûye, lê belê di dawîya jiyana xwe de qelew (şîşman) bû-

Lê belê mirov fîkrîn gi-ring ji rû distîne. Tîrêjîn hakimiyetê û qewetê jê tê û mirov ji rûye wî jîrîfî, lê ji çena wî ya mezin û ji rûye



Timur Lenk (1336-1405)

wî yê pozbilind canêşandin û xirabiye dixwîne. Hemû tiştên ku ji portreyê têx xwendin, bingehê xwe ji ilim distîne. Ku mirov mînakiyek bide, devê wî yê balkêş û bi hev dewisan-dî û lêva wî ya xwar işareta amadebûna İvanê Zalim a ji bo şer e.

150 Saliya Kalevala

Ji bo pîrozkirina 150 saliya Destana Kalevala ya Karêlî û Fînî, Wezareta Çande ya Karêlê (Di navbera Finlandiya û Sovyetê de herêmek e. N.W.) ji Galina

Lebedinskaya xwest, ku portreya dengbêj Arhippa Pertunenê Karel (1769-1841?) çêke. İşkeletê Pertûnen seqet bûbû. Ji sê pariyan pariye hestiyê pozê wî yê jîrîn winda bûbûn. Galina ji nuh ve van hestiyen afirand. Afirandina dirûvê Pertûnen yê rastîn nîv sal kişand û ev demeke rekör bû. Ku mirov normal bixebite, xebateke wiha salek dikşîne.

Teknîk

Teknîka ku Profesor Gerasimov bikaranî bi kurtî wiha bû: Bi aletên taybetî xetên işkeletê yê bingehîn têx xêzkinînê û pîvandînê. Besen hûr û hûr jî tê tesbit kirinê. Li ser işkeletê ji mastiksê kasen (keji) rû ku şiklê hinarikan dide, têx avakirinê. Aliyê din yê rû hêdî hêdî derdikeve rastê.

A dijwartirin afirandina çav, poz û dev e. Kûrbûna qulên çavan û sînora mezinahiyen wan, îmkana rast tesbitkirina çav bi xwe û şiklê qapaxen çavan dide. Hestiyê poz, li dor dawîya qulên pozê mirov tê afirandina. Firehbûna pozê mirov jî li gor rewşa hestiyê navîn tê tesbitkirinê.

Lêv, li gor bilindbûna diranen pêşî cî distînin. Fire-

hiya dev wek dûrbûna her du diranen biçûk yê diranen kursî (azi dîşî) ye û şiklê dev girêdayî rîza diranen serî û binî ye.

Şiklê por wek adetî li gor dilê mirov e. Carnan mirov ji wêneyen wê demê distîne.

Metoda Gerasimov roj bi roj pêşde dije. İro di xebata ji nuh ve afirandînê de ultra deng û stereofotografî têx bikaranînê. Laboratu-war alîkariya xwe ji polisan re didomîne û bi tevî muzyeyen welatîn din xebat dike.

Ji Kovara ‘Nûce ji Yekîtiya Sovyetê’ Haziran-1985 August 1986

